


Kêşeya kurd di sînoran hilnayê

Dr. Mehmet Hasgüler:

PKK bû
hedefa
stratejiya
NATO'yê



■ Kêşeya kurd bû sermijar


Berxwedana gelê kurd a li hemberî komploya navneteweyî di çapemeniya cîhanê de gelekî deng veda. Di kovar û rojnameyên cîhanê de kêşeya kurdî bû sermijar. Bo nimûne di kovarên amerîkî Time û Newsweekê de li ser kêşeya kurd û dîktetina Öcalan nûçe û nivîsên berfireh hatin pêşkêşkirin. Her wiha kovara almanî Der Spiegelê jî serhildana kurdan di berga pêşîn de ragihand xwendevanên xwe.

■ Girtin çare nîn e

Di nûçe û nirxandinên li ser kurdan de dîtina hevpar wekî çarenedîtina dîlgirtina Öcalan bû. Gelek pispor û şîrovegerên cîhanê dan zanîn ku bi girtina Öcalan kêşeya kurd aloztir bûye, lewre di çav tirkan de heta çek kar bike, pêwîstiya diyalogê nîn e. Her wiha jî bo kêşe aloztir nebe û şerek di navbera kurdan û tirkan de rû nede, naskirina mafên bingehîn ên gelê kurd tê xwestin. (Nûçe:R-3)

Pîştî komploya li dijî Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan, rewşa Rojhilata Navîn bêhtir balkêş û girîng bû. Lewre li herêma wê rûdan û hevkeşeyên nû pêk werin. Me li ser komploya, rewşa Rojhilata Navîn, oryantîzmê, tevgerên îslamî û sosyalîst, di rojeva cîhanê de cihê kurdan, politîkayên hukûmetê yê li ser kêşeya kurd û modelên li ser çareseriyê, digel Koordînatore Zaningeha Azad a li Stenbolê Mehmet Hasgüler hevpeyvînek çêkir. Hasgüler, li Zaningeha Azad li ser Rojhilata Navîn karûbarê mamostatiyê digerîne. (R.8-9)

Azadiya WELAT



E-Mail: s.berbang@usa.net

SAMÎ TAN

Stratejiya dewleta tirk a nû, bi tenê hiştina tevgera kurd û ji hev belavkirina sazî û artêşa kurdan e. Êrîşên li ser Yewnanîstanê, zagona poşmaniye û hişyarnameyên bo MED-TV'yê vê yekê nîşan didin.

Stratejiya dewleta tirk û kurd

Piştî ku dewleta tirk bi rêbazeke li derveyî hiqûqa navneteweyî Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan dil girt Îcar berê xwe da şervanên ARGK'ê û saziyên kurdan ên li metropolan û Ewrûpayê. Li gorî stratejiya dewleta tirk ku bi destê gladyoya navneteweyî hatiye diyarkirin, komploya navneteweyî bi dîlketina Öcalan gihîşt qonaxeke nû. Di vê qonaxê de armanca dewleta tirk jihevxiştina şervanan û saziyên kurdan in. Di nav saziyan de hedefên pêşîn MED-TV û HADEP in.

Ji bo pêkanîna vê yekê pêdivî bi şerekî gur ê psikolojîk heye. Ev kar jî dikeve ser milê çapemeniya tirk. Dema mirov bala xwe dide nûçe û nixandînen di medyayê de tê dîtîn û ev kar bi ruhê seferberiyê tê meşandin. Ji bo ku rastiyan berevajî bikin çî ji destê qelemşûrên tirk tê, dikin. Hemû rêz û rêçikên rojnamegerî û mirovahiye didin bin piyên xwe û bi awayekî tund êrîştî her kesê ku li dijî stratejiya MGK'ê

derdikevin, dikin.

Ev yek di helwesta xwe ya li hemberî çapemeniya navneteweyî de jî xwe dide der. Daxwaza wan ev e ku hemû kes kurdan suçdar bibînin û qirkirina kurdan bixwazin. Çi kesê ku qala çareseriyê dibe dibe hedefa çêrên wan. Bo nimûne ji ber ku di çapemeniya îngiliz de hinek nixandînen cihêreng hatin weşandin, rojnameya Sabahê roja 23'yê reşemiyê çêreke bi îngilizî derxist manşetê. Her wiha qunciknivîsên rojnameyên tirk jî şarezabûna xwe ya di warê çêrfiroşiyê de nîşanî dinyayê didin.

Li vê derê tiştê balkêş helwesta rayedarên ewrûpî ye. Ew li hemberî van çêr û dijûnan dengê xwe nakin, lê gelê kurd û televîzyonê kurdî wekî hedef nîşan didin. Ev yek jî dide zanîn ku li ba wan tu nixê mafdarbûnê nîn e, kesê hêzdar dikare her tiştî bike. Sedema vê helwesta ewrûpîyan jî diyar e. Jixwe ew jî mebesta xwe ya rastîn venaşêrin:

MED-TV di demeke kurt bi hezaran

kurd li hev dicivîne. Ew bi riya MED-TV ji bûyeran agahdar dibin û radibin ser piyan.

Heke mirov vegere ser mijara sereke, stratejiya dewleta tirk a nû, bi tenê hiştina tevgera kurd û ji hev belavkirina sazî û artêşa kurdan e. Êrîşên dewleta tirk ên li ser Yewnanîstanê, zagona poşmaniye û hişyarnameyên dewletên ewrûpî yên bo MED-TV'yê stratejiya dewletê ya nîşan didin.

Di vî warê de divê kurd jî hişyar bin divê heza xwe nîşanî cihanê bidin, lê xwe re dijîmînen nû çê nekin, bi endaze tevbigerin. Li aliyê din divê kurd li ser saziyên xwe gelekî hişyar bin, saziyên xwe biparêzin û xurtir bikin. Heke kurd karibin vê hêviya dewleta tirk pûç derxin, dikarin daxwazên wê yên stratejîk bi avê de bibin. Di warê jihevxiştina gerîla de zêde şansê dewletê tune ye. Lewre gerîla piştî xwe daye çiyayên welêt û gel û ew di her merc û rewşê de dikare xwe biparêze.

Divê cangoriyên welêt neyên jibîrkirin

Ferhengok

afîrîner: yaratıcı
alozi: tevlihevî
asteng: engel
awarte: istisnâ
bersuc: sanik
çalakî: eylem
çapemenî: basın
çavdêr: gözlemci
dadgeh: mahkeme
dadger: hakim
dadyane: adil
danişîn: duruşma
darizandin: yargılama
destkarî: mudahale
dilsoz: sadık, bağlı
dirûv: awa, şekl
dojeh: ceennem
doz: dava; istek
dozger: savcı
dozname: idianame
gengeşî: tartışma
girav: ada
gotûbêj: niqaş
haydar: haberdar
helwest: tavir
heman: eynî
hestiyar: hisî, hesap
hevalbend: mütefik
hevkeşe: denge
hincet: gerekçe
jêderk: kan(kaynak)
kendav: körfez
kêşe: problem
komar: cumhuriyet

lêpirsîn: sorgulama
lewre: ji ber ku, loma
lidarxistin: düzenleme
mêtingeh: sömürge
misogerkirin: garan-
tîkirin
navneteweyî: ulus-
lararası
netewe: millet
neteweperestî: soven
milliyetçilik
parezer: ebûkat
paşverû: genç
pergal: sistem
pêvajo: süreç
pêwîst: lazım, gerek
peyitandin: ispatkirin
peywîr: vatîni, vezîfe
pispor: şareza (uzman)
pîvan: ölçüt
qeyran: kıfz
rapefîn: atılım, kalkışma
rêbaz: azine, metod
rewşenbîr: aydın
rojawayî: batılı
serdan: ziyaret
sirûd: marş
şanênav: imza
şermezarkirin: protestokirin
tawanbar: suçlu
tevger: bızav, hareket
wêje: edebiyat
xwepêşandan: gösteri

ADAR JIYAN

Cangorîti mertebeya herî berz û pîroz e. Bêguman tu nix bi qasî cangoriyên welêt paye-berz û watedar nabin. Lewre ew bedena xwe ya fanî fedayî jiyaneke mayînde dikin.

Cangoriyên me wekî şîrê parzî-
nandî pak û paqij, wekî ava kaniyan
sayî û zelal in. Kevneperes-
tiyên hezar salan, rik û gira di
navbera kurdan de, ezperestî û
berjewendiyên kesane bi xwe-
fedakirinê ji holê tê rakirin. Ew
bêrûmetî û rûreşiyên ku wekî
çarenûseke neguherbar dihate
dîtîn, bi çalakiyên wan ên pî-
roz tar û mar bûn. Dîroka têko-
şîna kurdan bi xwîna şehîdan
hate nivîsandin. Têkoşîna Aza-
diyê bi xwîna wan kete rojeva navne-
teweyî û cihanê berê xwe da kêşeya
kurd.

Li cangoriyên welêt xwedî derke-
tin li ser me ferz e. Ji bo ku em vê we-
zîfeyê bi cih binin jî, divê em li ser
rêça wan bimeşin. Li bîranînen wan
xwedî derketin, wezîfeya hemû we-
latparêzan e. Gelê ku bi şehîden xwe
ve negirêdayî be, ne gengaz e ku bibe
xwediyê nixên bilind. Nixê mirov ê
herî mezin welat e. Welat bi xwîna
şehîdan rizgar dibe. Îro bihustek xaka
Kurdistanê nemaye ku bi xwîna şehî-
dan nehatibe avdan. Cara yekem e ku

gelê kurd ji bo şehîden xwe govendan
digerîne û bi meşên girseyî wan defin
dike.

Cangoriyên me rûmeta me ne. Her
yek ji wan pêtalet e û riya me ronî di-
ke. Her yek ji wan rojek e jiyane dide
me. Her yek ji wan stêrkek e li ez-
manê welêt diçirûse. Em di nava şe-
vereşê de li ber şewqa wan dimeşin.
Axî û keserên me bi stranên wan der
dibin. Dembuhêrkên me bi bîranînen

Nixê mirov ê herî mezin welat
e. Welat bi xwîna şehîdan riz-
gar dibe. Îro bihustek xaka Kur-
distanê nemaye ku bi xwîna şe-
hîdan nehatibe avdan. Cara ye-
kem e ku gelê kurd ji bo şehîden
xwe govendan digerîne.

wan derbas dibin. Civat û govendên
me yên giran ji bo wan digerin. Di dî-
lok û metelokên me de navê wan der-
bas dibe. Hest û xeyalên me bi wan
dixemilin. Hêstirên me bo wan diba-
rin. Agirê dilê me bi wan geş û jiyana
me bi wan xweş dibe. Îcar cangorîti
çî ye? Tiştêkî ku ji bo nefsa xwe bi-
bin nîn e. Tenê canekî wan heye û ew
jî wî canê xwe bêtirs bo welêt gorî di-
kin. Ew ji bo ku ji gelê xwe re jiyane-
ke birûmet û warekî azad bihêlin ji-
yana xwe feda dikin.

Wan, peywira xwe bi cih anî û
deynê xwe da. Îcar em dê çiqasî bika-

ribin peywira xwe bi cih bin?
deynê xwe bidin? Em baş dizanin
barê me ji yê wan girantir e û pey-
ra me ji ya wan zortir e. Wan ji
latê xwe hez kir û di riya wî de
xwe da. Wan soz da gelê xwe û so-
xwe bi cih anî. Lê em? Emê çawa
barê giran bikaribin hilînin? Em
çiqasî karibin li pey şopa wan bin?
şin û çawa bikaribin bibin lay-
wan? Gelo çend mirovên sax dê ka-

bin peywira xwe ya ji bo wan
bi cih binin? Gelo çend kes
karin di payebilindî û giran
habûna wan bigihêjin? Gelo
çend kes dikarin der barê wan
zînbûna wan de biaxivin?
Mafê tu kesî tune ku cangorî-
tiyê bi du hevokan rave bike?
an jî wateya wê ya rastîn
bike. Ji bo ku mirov karibe
ser wê wateyê binivîse ne

ra pênuşan û ne jî rûpelên lêmûşkî
têrê dikin. Tiştên ku me nivîsîne
deryayê ne dilopek e. Gelo mafê
heye ku em wê dilopê hilînin? Dî-
ku mafê me tunebe, lê belê hestî-
me, me zorga dikin û lîxwedîderke-
na cangoriyên me bi bîra me dî-
Pêşiyê em lêborîne jî şehîden xwe
paşê jî ji gelê xwe yê birûmet dix-
zin.

Cangoriyên me rûmeta gelê me
Mafê her kesî heye ku li şehîden
xwedî derkeve û wan bi bir bîne
mafê tu kesî tune ye ku wan ji bir

Kêşeya kurd di sînoran hilnayê

Piştî dîlketina Serokê Giştî yê PKK'ê, bi hefteyekê jî, çalakiyên kurdan kêm nebûn. Li seranserê cîhanê çalakiyên kurdan pêk hatin. Beramberî vê yekê di çapemeniya cîhanê de li ser Kêşeya Kurd nûçe û nivîsên berfireh hatin weşandin. Bo nimûne, du kovarên amerîkî yê navdar "Newsweek û Time"ê çalakiyên kurdan û dîlketina Öcalan di berga pêşîn de ragihandin. Her wiha di gelek rojname, kovar û rojeva ajansan de jî kurd sermijar bûn.

Di nixandina li ser Kêşeya Kurd de dîtina hevpar ev bû ku, bi girtina Öcalan Kêşeya Kurd çareser nabe û heke Tirkiye li ser rîya berê ya şerperest bimeşe, dê her tişt aloztir bibe. Di kovara Newsweek de tê gotin ku dîlketina Öcalan 12 milyon kurdên li Tirkîyeyê nêzîkî hev kirine. Her wiha kovar cih dide van gotinên Serokê Înstîtuya Kurdî ya li Parîsê Kendal Nezan: "Mirov tiştên bi vî rengî dibêjin 'madem cîhan li kurdan bûye doje, nexwe em ê jî rabin ser piyan û cîhanê li Tirkîyeyê û hevalbendên wê bikin doje.'"

Öcalan diyalog dixwest

Di dawîya nûçeya Newsweekê de ev nixandîna hatiye kirin: "Girtina Öcalan dibe ku rê bide Tirkîyeyê, da ku dawî li şer binin (heke dixwazin). Di meha sermawezê de Öcalan ji Kendal Nezan re gotiye, ew dixwaze bi Tirkan re bikeve danûstandinê. Öcalan dixwaze mafên çandî yê kurdan (bi taybetî jî perwerdehî û weşana bi zimanê kurdî) misoger bike, ji bo şerwanên xwe efûyekê bi dest bixe û rîya avakirina partiyekê siyasî ya kurdan, lê ne cûdaxwaz, veke." Piştî van gotinan di nûçeyê de hatiye gotin ku li Tirkiye vekirina rîya diyalogê bo siyasîmedarên tirk xwekuştin e. Nûçe bi vê hevokê diqede: "Heta çek kar bikin, dê gelek tirk sedemekê nebînin, ji bo li ser mafên kurdan ên bingehîn gotûbêjê bikin."

Di nav rûpelên kovara navborî de akademîsyenê tirk Doğu Ergil jî nivîseke nixandîna nivîsiye. Di vê nivîsê de jî tê gotin ku girtina Öcalan dikare bibe sedema aloziyên mezintir. Ergil, diyar dike ku heke nayê xwestin ku tirk û kurd bikevin qirika hev, divê rîya çareseriyê aştîyane bê vekirin.

Kovara Time helwesteke nêzîkî îdeolojîya fermî ya Amerîkayê girtiye. Di vê nivîsê de hêrsa kurdan bi van gotinan hatiye pêşkêşkirin: "Emê hemû kullîkan bi-qurmiçînî û serê hemû çivîkan jêkin." Di nav nûçe û nixandînan kovarê de girseya kurd a li Ewropayê wekî hedef hatiye nîşandayin û tevgera gelê kurd wekî terorîzm hatiye binavkirin. Lê li gorî îdiaya nivîskarên kovarê nasnekirina mafên gelê kurd, ev tevger xurt kiriye. Di nava rûpelên kovarê de bi sernavê "Neteweperwerên bînetewe (bêwelat)" de li ser dîroka kurdan û PKK'ê hinek agahî hati-



Piştî komploya navneteweyî Kêşeya Kurd di çapemeniya cîhanê de bû sermijar. Di kovarên mîna Time, Newsweek û Der Spiegel de sermijar kurd bûn. Di hemû nivîs û nûçeyan de dîtina hevpar ev bû; bi girtina Öcalan çareseriyê Kêşeya Kurd diwartir bûye.

ne dayin. Ev nivîsa nixandîna jî hêla Rod Usher ve hatiye nivîsandin. Di dawîya vê nivîsê de jî tê gotin ku bi girtina Öcalan, dê Kêşeya Kurd aloztir bibe.

Di kovara "The Economist"ê de di bin sernavê "Trajediya kurdan" de nivîsek hatiye weşandin. Di vê nivîsê de jî hatiye daxuyandin ku Kêşeya Kurd bi girtina Öcalan çareser nabe, kêşe bi awayekî jixweber bûye navneteweyî û ji Ewropayê tê xwestin ku forûmekê bo kurdan û tirkan amade bikin, da ku karibin kêşeyê bi riyên demokratîk çareser bikin. Nivîs bi vê hevokê diqede: "Niha tirk dikarin vê forûmê red bikin, lê kurd dev jî doza xwe bernadin. Her çiqas mafê dewletbûnê ne mimkûn be jî, kurdan nêzîktêdaneke dadyane û hikûmetê herêmi heq kiriye."

Di kovara "Le Monde Diplomatique"ê jî bi sernavê "Stratejiyê nû ji bo kurdan" de nivîsek hatiye weşandin. Di vê nivîsê de bi awayekî berfireh li ser helwesta kurdan û amadekariyên kurdan ên ji bo pêşerojê hatiye rawestandî. Di nava nivîsa navborî de li ser xebata pêka-

nîna Kongreya Neteweyî hatiye rawestandî û girîngiya wê kongreyê bo sivilbûna tevgera kurd hatiye zimên. Nivîskarê vê rojnameyê Michel Verrier daxwaza dewleta tirk a ji bo endamtiya Yekîtiya Ewropayê, bo gelê kurd wekî şansêkî dibîne.

Di nava nivîsê de qala xebatên Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan ên ji bo vekirina rîya diyalogê û rêzgirtina bo pîvanên şer jî hatiye kirin. Bo nimûne hatiye diyarkirin ku Öcalan fermandarên ku li gorî rêz û rêçikên pîvanên şer tevnegeriyane ceza kirine û Şemdin Sakik jî bi tenê hiştiye, wî xwe spartîye PDK'ê.

Her wiha dîsa hatiye diyarkirin ku roja 24 rêbendana 1995'an de bi civîneke çapemeniyê li Cenevreyê hatiye diyarkirin ku, dê PKK li gorî Peymana Cenevreyê şerê xwe bimeşîne. Wekî din hatiye gotin ku Öcalan kuştina mamoste, jin û zarokan şermezar kiriye.

Di nivîs û nûçeyên li ser kurdan de tiştêkî bi berfirehî li ser hatiye rawestandî jî, rola Amerîka û Îsraîlê ya di dîlgirtina

Öcalan de ye. Bi taybetî piştî ku li Berlînê sê Kurdistanî ji hêla ajanên Îsraîlê ve hatin kuştin, rola vê dewletê ya di komploya navneteweyî de zêdetir hate rojevê. Lê hem rayedarên dewletê hem jî çapemeniya wê, rola xwe ya di vî karî de red kir. Di çapemeniya Îsraîlê de digel vê yekê hevalbendiya bi Tirkîyeyê re jî hate rexnekirin.

Rola Amerîka û Îsraîlê

Rojnameya Jerusalem Post di hejmarê xwe ya roja 18'ê reşemiyê de bi şanavê Arie O'Sullivan nivîsek weşandiye. Sernavê nivîsê "Çima kurd me tawanbar dikin?" e. Di nava nivîsê tê gotin ku ajanên Îsraîlê li ser cihê Öcalan agahî dane Tirkîyeyê. Di nava nivîsê ev gotinên Alon Liel ku li Enqereyê dîplomati kiriye balê dikişînin: "Zelal e ku kurd ev demek e bi çavekî din li me dinêrin. Bi mehan e ku ez dibêjim hevalbendiya bi Tirkîyeyê re hinek kêşeyan bi xwe re tîne. Em bi bûkeke ku malbata wê bi problem e re zewicîne. Ez ne li dijî tîkiliyên dostane yê bi Tirkîyeyê re me, lê divê em kêşeyan û sedemên wan bizanin."

Her wiha akademîsyen Prof. Efraim Inbar jî gotiye, divê ew kar û zerara hevalbendiya bi Tirkîyeyê re baş bipîvin. Di nûçeyê Ben Lynfield de jî van gotinên pisporê kêşeya kurd û Iraqê cih girtiye: "Ji bo ku tansiyon bikeve, divê em hin tiştan bikin, nexwe dê serê me gelekî biêşe."

Li aliyê din DYA'yê helwesteke dijberî helwesta Îsraîlê nîşan da û rayedarên vê dewletê bi awayekî vekirî daxuyand ku CIA'yê alîkariya tirkan kiriye. Li gorî nûçeyê ku roja 20 reşemiyê di rojnameya The New York Times hatiye weşandin de, rayedarekî Amerîkayê li xe mikur hatiye û daye zanîn ku CIA'yê agahiyên li ser cihê Öcalan daye ajanên tirkan. Tevî vê helwesta Amerîkayê jî di çapemeniya vî welatî de jî nivîsên ku bi awayekî din nêzîkî mijarê dibin tînin.

Bo nimûne roja 22' reşemiyê nivîseke profesore Zanîngeha Navneteweyî ya Florîdayê Charles G. MacDonald di rojnameya Miami Herald hatiye weşandin. Di vê nivîsê polîtîkayên dewleta Amerîka yê li ser Kêşeya Kurdî hatiye rexnekirin. Li gorî nivîskar divê DYA zêde nede ber dilê Tirkîyeyê û bi zimanê wê xeber nede. Bo nimûne peyva terorîst peyveke divê bo PKK û Öcalan neyê bikaranîn. Lewre kesên mîna Mandela, Yaser Arafat û Benahin Begin jî pêşî ji aliyê hinekan ve wekî terorîst dihatin binavkirin, lê piştê nerastbûna vê helwestê hate peyitandin. Nivîskarê navborî dibêje ku heke Amerîka helwesta xwe neguherîne, dema Öcalan bi awayekî nedadyane bê darizandin, dê digel Tirkîyeyê DYA jî ji hêla raya giştî ya cîhanê ve bê şermezarkirin.

NAVENDA NÛÇEYAN

Lîsteya berendamên HADEP'ê

Amed

Murat Bozlak
Ali Ürküt
Sevahir Bayındır
M. Cemal Koçer
Şükran Aydın
Abdullah Turhallı
Birsal Akad
Selma Tanrikulu
Ali Zgen
Musa Farisoğulları
Halit Nazmi Balkaş

Riha (Urfa)

Celalettin Erkmen
Sinan Sonkurt
İzzettin Kalaycı
Mehmet Ural
Naif Aslan
Bahri Deprem
Mehmet Altındağ
Vahit koyunlu
M. Ali Özlemir
Mahsum Akgül
Halim Can

Semsûr (Adıyaman)

Cemal Coşkun
Rıza Kılıncı
Mehmet Akar
Ali Çetinkaya
Mikail Akbaba

Agirî

Haydar Öztürk
Ömer Güler
Mehmet İsmailoğulları
Abdurrahman Yıldırım
Çewlik (Bingöl)
M. Nuri Özmen
Mehmet Bazancir
İnce Adıbelli

Bedlîs

M. Nezir Karabaş
M. Şefik Kuntaş
Alper Tunga Gebeloğlu
Enver Karabey

Elezîz

İhsan Koçoğlu
Abdulrezzak Oral
Derbaz Söğüt

Erzîngan

İkram Onat
Abdulhalim Fidan
Mehmet Ali Şimşek

Erzerom

Melik aygül
Abdumelik okyay
Tayfur Bingöl
Nurettin özdemir
Recep Diyar
Medeni Kavak
Hacı Çetinkaya
Yusuf Aslan

Dîlûk (Antep)

Burhanettin Bolu
Abdullah İnce
Zinnet Demirbaş
Hasan Özpolat
Şükrü Altındağ

Mehmet Şeker

Ali Koç
Ahmet Bayram
Mustafa Ünlü
Çolemêrg
Hamit Geylani
Nihat Buldan

Qers

Mehmet Alkan
Rasim Boztoprak
Aslan Yüce

Meletî

Ali Özcan
Hasan Doğan
Önder Şahiner
Mehmet Kılıncı
Beser Kaplan
Mahmut Güngör
Cumali Uyan

Gurgum (Meras)

İsa Karakurt
Halime Han
İbrahim tofan
Süleyman Buldu
Nayif Bektaş
Ata Aktürk
Mehmet Sıraç Sağın
Hacı Çakmakçı
M. Nasip Çiçek
Mêrdîn
Osman Özçelik
Farhan Türk
Aziz Baran
Hizni Çınar

.....
Mehmet Kani Monis

Mûş

Şadi Özdemir
Mahinur Taş
Mehmet Baloğulları
Veysel Kıran

Sêrt

Veysel Turhan
Mahmut Yıldız
Abdurrahman Taşçı

Sêwaz

Cevzet Akgün
Miktat Boz
Süleyman Yıldız
Lezgîn Bingöl
Hasan Doğan
Remzi Mete

Dêrsim

Şerafettin Halis
.....

Wan

Mehmet Tekin
İsmail Göldaş
Cevdet Armutçu
Hamdi Demir
Bedrettin Fidan
İbrahim Aydınoglu
Ruknettin Hakan
Êlih (Batman)
Ali Hıdır Doğan
Salih Yıldız
İsmatullah Güney
Mahmut Ekmen

Erdehan (Ardahan)

Ramazan Yıldız
Orhan Palavan
Şirnex
Resul Sadak
Safiye Akalın
Abdullah Özcan
İdir (İğdır)
M. Nuri Güneş
Ferzende Abay

Edene

Eyüp Karageçi
Fatma Kurtulan
Fatma Nevin Vargün
Hasan Beliren
Ahmet Yıldız
Abdulhamit Çelik
Vahdettin Emen
Mehmet Can Çelik
Kamil Akalın
Salih Ergün
Salih Timur
Abdulaziz Tekin
Mehmet Cevat Aydın
Orhan Kızılkaya

Enqere (Berendamên herêma 1.)

Ali Rıza Yurtsever
Halil İbrahim Özdemir
Kazım Çakır
Fahrettin Kılıç
Meliha Özcan
İsmail Şahin
Tevfik Demir
Halil Metin
Mehmet Emin Aras
Yener Yardımcıel
Ayşe Çetin
Ramazan Gültekin
Lezgîn Kutum
Nazihat Varlı

Enqere (Berendamên herêma 2.)

Kemal Bülbül
Levent Kanat
Serpil Salman
Yusuf Türkan
Hüsamettin Avşar
İsmet Aras
M. Mesut Akgül
Mehmet Özgül
Ahmet Hakan
M. Şirin Yüksel
Nurettin Kemertaş
Ahmet Erbek
Ziver Acar
Cevdet Malgaz

Antalya

Hüseyin Belcioğlu
İzzettin Çelik
Vural Çiçek
Selhattin Tunç
Ahmet Kanlıada
İhsan Nergiz
Ahmet Oral
Hazne Akbel
Abdulkadir Acar

Abdulhalim Ertekin

Şükrü Ekin
Hasan Sönmez
Hatay
Fatih Egemen
Fatma Aydınçı
M. Veysi Öner
Abdullah Aydar
Mehmet Tunç
Hüseyin Eroğlu
Mahsun Aydın
Ercan Doğan
Zeynel Toğagör

Mêrsin

Ahmet Turan Demir
Salih Özdemir
Salih Çakır
Arife Yıldırım
Halil İbrahim Ayıldız
Mehmet Erel
Reşit Aydın
Fevzi Alkuş

Stenbol (Berendamên herêma 1.)

Bahattin Günel
Mürüvet Yılmaz
Ali Can Ünlü
H. Hayri Alkan
Filiz Köstak
Hayri Demirel
Yusuf Uçar
Sunullah Altan
Ahmet Karaoğlu
Atilla Özdoğan
Mirhan Avcı
Ali Uçan
Aziz Çakmak
Mülazım Özcan
Ali Aktürk
Kahraman Yıldız
Ümit Topçu
Ercan Elden
Galip Erdoğan
Rabia Demircioğlu
Semra Gürbüz
Alican Sarı
Mehmet Sıddık Mağ
Baykan Akbaş

Stenbol (Berendamên herêma 2.)

Mehmet Satan
Ragıp Zarakolu
Düzgün Akyol
Yusuf Çirik
Hatice Çoban
Mehmet Korkmaz
Serap Mutlu
Ali Ateş
Sakine Akdeniz
Mustafa Sadık
Cafer Selçuk
Mehmet Atik
Hacı İbrahim Erdoğan
İsmet Yıldiko
Ramazan Kaplan
Selhattin Yeşil
Nezir Tabar
Zeynel Bulut

Abdulkerim Genç

Nurettin Aslan
Enver Aslan
Stenbol (Berendamên herêma 3.)

Pervin Buldan
Mahmut Özgür
Musa Sağnıç
Süveyde Uğurlu
Necya Yıldırım
Abdulahap Has
Zarife Söylemez
Lezgîn Bingöl
Göğercin Turan
Ömer Yokuş
Mehmet Emin Sarı
Mehmet Sıddık Gün
Enver Demir
Nazime Kadroğlu
Necip Bingöl
Faik Sevilgen
Abdulahkim Filiz
Mehmet Cemal Türk

Hanife Yüceli

Mehmet Avcı
Ahmet Demir
Hikmet Zeren
Mehmet Ongullu
Özdemir Gökcan
Kocaeli
Biro Görmez
Halil Demir
İmam Akgül
Hasan Gökçen
Saniye Çelik
Davut Yılmaz
Mehmet Karahan
Yaşar Alioğlu
Hasan Dalgıç
Bahattin Kınay

Konya

Mustafa Ceren
Leyla Güven
Hasan Kaplan
Osman İslalbey
Sami Koça
M. salih Çetin
Ali Köneş
Daim Akçakoca
Muhsin Demirbaş
Nezir Yıldız
Felemez Şen
Cemel Dursun
İbrahim Şilen
İsmail Hakkı Aksu
Abdulhamit Çetin
Mulla Bekmezci

İzmir (Berendamên herêma

1.)

Ali Yavuz
Sadık Demircan
Hasan Kater
Mahmut Önen
Neriman Birlikler
Esat Başkaya
M. Nesi Altinsöz
Talip Çabuk

Alpaslan Aktan

Kadir Türker
Ahmet Kortak
Şemsettin Yılmaz
İzmir (Berendamên herêma 2.)

Aynur Gürbüz
Halis Saka
Cemile Tutar
Alattin Bayhan
Vefa Yüce
Mehmet Işıklı
Ayşe Fatma Boztepe
Yurdağül Topal
Hatın Alagöz
Ahmet Aslan
Celal Özgün
Meryem Dayan

Bursa

Mehmet dağtekin
Ramazan Sönmez
Ali Metin
Ahmet Can
Seyyfettin Pektaş
Metin Yalçın
Ali Türk
Osman Kocaman
Kerem Çalışır
Abdulaziz Amak
Seyfettin Kazat
Mustafa Yenen
Hacı Kuru
Rıza Köse
Osman Ünal
Cüneyt Çoban

Berendamên serokatîya beledîyeyên bajarên Kurdistanê:

Amed: Feridun Çelik
Agirî: Hüseyin Yılmaz
Bedlîs: İshak Tepe
Semsûr: M. Sait Aktaş
Dîlûk: M. Sait Uğu
Qers: Tunçer Bakırhan
Meletî: Mustafa Türk
Sêrt: M. Selim Özalp
Mûş: Mehmet İpek
Dêrsim: Musa Kulu
Çewlik: Feyzullah Karaaslan
Elezîz: Metin Aktaş
Gurgum: Esat Öztoprak
Mêrdîn: Cemal Veske
Êlih: Abdullah Akın
Riha: Bozan Yücel
Wan: Şahabettin Özarlaner
Çolemêrg: Hüseyin Ümit
İdir: Hasan Alagöz
* Berendamên Erzerom û Erzînganê nehatine diyarkirin.

Ziman jî bi civakê re diguhere

Di zimanekî de pêşketin têkildarî pêşketina civaka ku bi wî zimanî dipeyve ye. Pêşketin û geşedana di jiyana civakê de pêdiviya derbirina hinek hest û ramanên nûhatî dide pêş. Li ser vê yekê mirov zorê didin xwe da ku wan hest û ramanên xwe yên nû îfade bikin. Wê demê mirov jixweber dest davêjin hinek riyana da ku zimanê xwe zengintir bikin.

Riya herî hêsana qerzkariya peyv û tîgihên biyanî ye. Ango mirov ji zimanên din hinek peyv û tîgihan digirin û dixin nava zimanê xwe û bi vî awayî jî zimanê xwe dewlemend dikin. Lê ev riya herî hêsana rê li ber tîgihên zimanê neteweyî vedike. Ji bilî vî mirov dikarin li gorî rewşa xwe ya nû wateyên nû li peyvên berê bar bikin.

Her wekî çawa civak bi domana demê re kirasê xwe diguherîne, hinek peyv jî kirasê xwe diguherînin û kirasekî nû li xwe dikin. Peyv dikare bi çend cureyan kirasê xwe biguherîne. Heke heyber ku peyv nişan dide, bi temamî di jiyana civakê ya nû de bêwate mabe, di peyvê de wateya kevn bi temamî tê jibîrkirin û bi wateya xwe ya nû cih digire. Heke hê jî ew heyber bersivê dide pêdiviyeyeke civakê wê demê, wateya peyvê berfirehtir dibe û ji bo her du tiştan tê bikaranîn.

Mînakên bi vî rengî di zimanên wekî îngilîzî de ku di nava guherîneke bilez û bez de ne pir in. Bo nimûne peyva "hardware" di demên berê de bi wateya navgînên metalî hatiye bikaranîn. Lê bi der-

Ji bo ku mirov karibe bi awayekî zanistî bi karê pêkanîna peyvan rabe, pêwîst e ku mirov qertafên di zimanê kurdî de (çi paşgir û çi jî pêşgir) baş nas bike. Heke na mirov dikare bibe sedema hinek alozî û sergêjiyan. Lê xebatên li ser qertafan di asta destnîşankirinê de mane. Pêwîst e êdî mirov li rist û peywira wan hûr bibe.

ketina kompûterê re wateya xwe berfirehtir kiriye û cihê alav û pêçeka kompûterê ya fizîkî girtiye. Her wiha peyva "mouse" jî navê ajalekî ye, lê îro ji bo navgîneke kompûterê jî tê bikaranîn. Îro tirk ji vî navgînê re "fare" dibêjin û kurdên ku bi karê kompûterê dadikevin dikarin peyva "mişko" bi kar binin.

Mirov dikare di kurdî de ji bo peyvên bi vî rengî çend mînakên bide. Îro peyva welat bi du wateyan tê bikaranîn. Hem di wateya berfireh de ku bo kurdan Kurdistan e. Hem jî di wateya teng de ku cihê memleketa erebî digire. Mirovên berê welat bi tenê bo cihê ku ew lê dijîn bikar diyan. Lê îro wateya kevn hêdî hêdî tê jibîrkirin û êdî peyva welat bi piranî di wateya berfireh de tê bikaranîn. Heman tişt jî bo niştiman jî rast e. Niştiman bi zaryavê soranî ye û ji du hêmanan pêk tê: Nişt-man. Niştin bi cih û war bûn e. Qertafa /-man/ di soranî de cînavkeke kurtkirî ye û cihê kesê yekemîn ê pirjimar digire. Wekî xoman (em bi xwe). Her wiha îro em peyva pirêze di cihê pratîkê de bi kar tinin. Tê zanîn ku pirêze di dema pa-

letiyê de ji erdê ku mirov li pey xwe hiştîye re tê gotin. Ji ber ku pirêze destkirê mirov nişan dide, ew peyv hêdî hêdî cihê pratîka zimanên ewrûpî digire.

Rêpîvana pêkanîna peyvan

Riyeye dewlemenkirina zimên a din jî afirandina hinek peyv û tîgihên nû ye. Afirandina peyvan di her zimanî de bi awayekî pêk tê. Bo nimûne di zimanê yekîte de her kîteyek xwedî wateyekê, mirov wan kîteyan pev dixin û bi vî rengî peyvên nû pêk tinin. Di zimanê erebî de bi tîpên dengdar hinek qalib hatine afirandin û ew qalib bi dengdêran tîpên dagirtin û peyveke nû derdikeve holê. Wekî mînak ji tîpên "ktp" bi alîkariya hinek dengdaran peyvên mîna "kitêb, mektûp, katîp, mektep" tîpên afirandin.

Di hinek zimanan de jî pêk anîna peyvan bi alîkariya qertafan pêk tê. Di vî warî de jî ziman bi awayekî din ji hev vediqetin. Hinek ji wan zimanan bi tenê qertafan tinin dawîya peyvê. Zimanê tirkî zimanekî bi vî rengî ye. Wekî mînak mirov dikare peyva "yol-daş-lar-ımız" bi-

de. Mirov nikare qertafekê bine seriya peyva "yol" ku koka peyvê ye.

Di hinek zimanan de jî qertaf hem tê dawiyê û hem jî tê seriya peyvê. Zimanê kurdî jî wekî gelek zimanên din ên hind-ewrûpî zimanekî bi vî rengî ye.

Di zimanê kurdî de gelek paşgir û pêşgir hene û heke mirov bi awayekî zanistî ji wan sûtê wergire, mirov di pêkanîna peyvên nû de qet tengasiyê nakişîne. Lê heke mirov bi awayekî zanistî nêzîkiyê di mijarê nede, mirov dikare bi vî awayî bibe sedema sergêji û aloziyên mezintir jî.

Ji bo ku mirov karibe bi awayekî zanistî bi vî karî rabe, pêwîst ku mirov qertafên di zimanê kurdî de kurdî de baş nas bike. Lê xebatên li ser qertafan di asta destnîşankirinê de mane. Kêm kes li ser rist û peywira wan rawestiyaye. Hê jî gelek kes bêyî ku guh li xebatên hev bikin karê ku hatiye kirin nizanîm çendgisîn dikin.

Pêwîst e êdî mirov li rist û peywira wan hûr bibe. Kîjan qertaf ji kîjan cureya peyvê çî cure peyv pêk tîne û li gorî kîjan rêpîvanê mirov dikare bi wê qertafê peyveke nû pêk bîne? Her wiha ew qertaf çî wateyê dide peyvê? Divê bersiva wan pirsan bê dozandin. Ji bo vê yekê jî divê mirov gelek mînakên li pey hev rêz bike û li ser tîkiliya di navbera wan de hûr bibe. Divê di vî xebatê de bi tenê li ser qertafên ku pir tîne bikaranîn bê rawestandin.

SAMÎ BERBANG

Pêşeroja me

NEJDET BULDAN



E-Mail: Buldan@compuserve.com

Dewleta tirk bi rîya çapemeniyê bi hemû dezgehên dewletê şerê xwe yê psîkolojîk dimeşîne. Gelek derew bi destê çapemeniyê tîne nivîsandin û weşandin. Gelek derew û şîroveyên çewt bi devê berdevkên dewletê tîne belavkirin. Bêguman ew xebata wan ji niha wê de jî dê berdewam be.

Mîna alozî û nakokiyên navbera PKK'ê. Bi destê dewleta dagirker gelek derew dê bêne kirin. Carinan rêveberên partiyê dê îşyan bikin, carinan jî desthilatiya Partiyê, carinan jî dê qaşo xwe teslîmî Tirkiyeyê bikin. Bi piranî li ser belavbûna gerîla gelek tişt dê bîne gotin û nivîsandin. Li ser rewşa Öcalan jî pir tiştên ku morala gelê me xerab dikin dê bîne weşandin û nivîsandin. Di nav wan gotin û nivîsandinên dagirkeran de ji sedan yek jî rast der-nakeve. Lê ewê karê xwe yê qirêj

bimeşînin. Pêwîst e ku kurd guhdariyê li çapemeniya wan nekin û jê bawer nekin. Lewre xîma dewleta wan li ser derew û agahdariyên şaş hatiye danîn.

Di nava sazî û rêxistinên kurdan de jî gelek aloziyên destçêkirî, dîsa bi destê dewletê dê bîne îlankirin. Par jî wisa bû, îro jî dê wisa be. Dibe ku gelek kesên di mîjîyê xwe de zelal nebûne, bikevin kemîna dewletê. Dibe ku kesên ji aliyê bîr û baweriyê ve sist, bi rewşekê wan sistiyên xwe eşkera bikin. Dibe ku hinek kes an jî sazî valatiyekê bibînin û bixwazin li nîrxên neteweyî bibin xudan. An jî mîna teyrên li ser kelexan, bikevin ser mîrasên Têkoşîna Neteweyî. Bi leşkerî, psîkolojîk û siyasî dewleta tirk dê êrîşên xwe zêde bike. Ew êrîş ne tenê li Tirkiyê an jî li bakurê Kurdistanê dê bîne meşandin. Li kîjan devê kurdên welatparêz hebin, ev der hede-fên êrîşan e. Ji bo lêbandin û agahiyên derew hemû dezgeh û sazîyên wan seferber bûne. Ji bo ku manewiyata kurdan pê xira bibe, rastî û derew dê tevî hev bibin.

Lê wezîfeyên me çî ne?

Em cîhanê nakin dijminê xwe. Lê ev nayê wê wateyê ku çalakî û mafparastinên

demokratîk û dîplomatîk dê bîne rawestandin. Li derveyê welatê û rêbazên nû dê bêne bikaranîn. Ji bo çareserkirina pirs-girînga kurd û parastina tenduristiya Öcalan xebatê bê rawestan berdewam in. Di vî xalê de naskirina welatên dost û neyar, helwesta me û wan cihê herî girîng digire.

Biryarên Kongreya Şeşemîn ya PKK'ê hêj eşkera nebûne. Ez bawer dikim ku dema biryar zelal bûn, gelek xebat û çalakî jî dê bi pêş ve biçin. Ji ber ku aqûbeta pirs-girînga kurd bi destê çalakîyên çekdarî eşkera dibe. (Ev xal jî bo gelê kurd girîng e.)

Di girtin û darizandina Öcalan de gelek hesabên navneteweyî hene. Helwesta DYA ya li ser başûrê Kurdistanê û helwesta tirkan a li ser vî mijarê ne nêzîkî hev e. Biryar û xebatên Amerîka yê li ser Sedam û başûrê Kurdistanê di demên pêşiya me de dê encam bidin. Têkiliyên tirk û yewnanan, tirk û Yekîtiya Ewrûpayê di nava delîveyeke teng re derbas dibin. Kurtiya wê, tirk dê bizanin ku girtina Öcalan ne çareserî ye. Mijar dijwartir e. Pêwîst e ku em kurd jî vî yekê bizanin.

Govendgerê dîlana şer:

Kenan Danîşman

Taybetiyeke Hevalê Kenan a berbiçav hebû; rûnerm û fedakar bû. Kîjan karê welatperweriyê jê bihata xwestin, jidil dixebîtî û bi serfiraziya wî karî şad dibû. Li zanîngehê tevî hemû çalakiyên ku pêk dihat, dibû û berpirsariyê dixwest. Ji bo pîrozbahîya Newroza 1990'î peywira wî peydakirina tekerên lastîk bû. Wî, teker li ser stûyê xwe kir û anî kampûsê.



Navê Lehî yê rastîn Mûmtaz Kenan Danîşman e. Ew, ji Mûşê ji navçeya Bulanîkê bû û di sala 1966'an de ji dayik bûye. Kenan, piştî ku demekê li zanîngehê xebatê dîke, tevî nav refên gerîla dibe û di sala 1993'yan de digihêje karwana pakrewanan.

Gelê kurd, neteweyê şahiyê ye. Şer û şahî çiqas dijberê hev bin jî, bi şeweyê diyalektîkê li ba kurdan heman tişt e. Li nik kurdan şer dîlan e.

Di nava şerê êl û eşîran de jî, mirovên ku şer dikirin halan di xwe de hildidan. Wekî 'ez bavê filanê me, ez kurê filanê me!' Bi giyana xwe "halan hildan" beşek jî çanda kurdî ye. Ev rêbaz, di nava şerê şervanên ARGK'ê û leşkerê Artêşa Tirk de jî, ji hêla şervanan ve tê bikaranîn. Şervan di germa-hiya şer de dibêjin "Em şervanê ARGK'ê ne! Em leşkerê Kurdistanê ne!" û halana di xwe de hildidin. Jixwe ev jî nişan dide ku şer li ba kurdan şahî û dîlan e.

Yek jî van şervanên ku şer wekî dîlanê didît, şervanê devliken Lehî bû. Navê wî yê malbatî Mûmtaz Kenan Danîşman e. Ew, ji Mûşê ji navçeya Bulanîkê bû. Kenan, di sala 1966'an de ji dayik bûye.

Serdema zanîngehê

Hevalê Kenan li Zanîngeha Cumhuriyetê li beşa fizîkê dixwend. Di sala 1993'yan de tevî refên şerê azadiya Kurdistanê bû. Ew digel hevalên xwe derketibû. Ez û hevalê Kenan li dora 3 salan bi hev re man. Me li heman zanîngehê dixwend. Ji ber vê yekê ez wî baş dinasim. Digel vê jî gelek caran bo doza welat, em li Sêwazê bi hev re hatin binçavkirin.

Ez kesayetiya wî jî baş nas dikim. Berî ku ez qala wî bikim, ez dixwazim tiştêkî din bibêjim. Li Kurdistanê, bi gelemperî mirov xwedî du kesayetan e. Yek jê ya berî tevî nava şorêşê bibe; ya din jî ya piştî naskirina şorêşê ye. Min ji bo çî ev got? Gava ku mirov tevî şervaniyê dibe û pakrewan bibe, wê gavê tenanet bi erênî qala kesayetiya wî tê kirin. Gava ku ez qala kesayetiya Hevalê Kenan bikim û tiştên erênî û baş binim ser zimên, ev bi tenê ne ji ber şervaniya wî ye. Bi rastî kesayetiya wî bi tiştên erênî pêgeh bû. Berî ku ew tevî ARGK'ê bibe jî, hevalekî hêja û welatparêz bû.

Taybetiyeke Hevalê Kenan a berbiçav hebû; rûnerm û fedakar bû. Kîjan karê welatperweriyê jê bihata xwestin, jidil dixebîtî û bi serfiraziya wî karî şad dibû. Li zanîngehê tevî hemû çalakiyên ku pêk dihat dibû û berpirsariyê dixwest. Ji bo pîrozbahîya Newroza 1990'î peywira wî peydakirina tekerên lastîk bû. Wî, teker li ser stûyê xwe kir û anî kampûsê. Bi vê çalakiya xwe û serfiraziya ew gelekî dîlşad bûbû.

Hin serpêhatiyên ligel wî

Gelek serpêhatiyên me heye. Serpêhatî beşek jî jiyanî mirov e û gava serpêhatiyên pakrewanan bêne nivîsandin, ew bi xwe vedijin. Ji ber vê yekê serpêhatî ji nû ve zindîbûna dîrokê ye.

Em bi hev re, ji bo ku em guhesti-

nên(neql) li Girtîgeha Eskîşehîrê şermezar bikin, di greva birçîbûnê de bûn. Li Sêwazê, li avahiya Partiya Sosyalîst (ya Doğu Perinçek). Em û çepgirên tirk. Hinek ji me zêde birçî bûbûn. Hevalê Kenan bi henekên xwe morala beşdarî geş dikir. Gava ku me xwê bixwara wî digot "Ev bir buçuk Adana Kebabî ye!" û ku dema me ava şekir vedixwar jî digot: "Ev jî porsiyonek peqlewe ye!"

Bingeha Komera Tirk li ser înkarkirina gelê kurd hatiye danîn. Bi bawerîya rayedarên vê dewletê, çiqasî kurd werin înkarkirin, ew qasî jî bingeha vê dewletê 'xurt' e! Lê li hêla din jî vê politîka dewletê bertekek(reaksiyon) di kesayetiya kurdan de afirandiye an jî bûye sedema wê. Bi awayekî zelaltir, berpirsariyê dewletê çiqasî kurdan înkarkirin, gelê kurd jî ew qasî berteka xwe rê(nîşanî) wan dide.

Ji bo ku me ciwanên kurd, Komkujiya Helepçeyê şermezar kiribû, leşkerên tirk wekî her tim em xistin binçavan. Paşê em birin dadgehê. Dozger an dadger navên me yek bi yek xwend û tiştin ji me pirsîn.

Wekî min li jor jî gotibû, navê wî yê rastîn Kenan Danîşman bû. Lê polîsan gava ku îfadeyên me yên binçav dabûn dozgeriyê, navê Kenan wisa hatibû nivîsandin: M.Kenan Danîşman.

Dor hat ser navê wî û dozger ew xwend: "Mehmet Kenan Danîşman" Kenan yekser îtiraz kir û lê vegerand:

- Efendim benim adım Mehmet Kenan değil, Mûmtaz Kenan (Ezbenî! Navê min ne Mehmet e Mûmtaz e!)

Li ser îtiraza Hevalê Kenan dozger jî hêrs bû.

- Yahu ne fark eder! Ha Mûmtaz ha Mehmet! (Kuro! Ma çî ferqan wan heye! Çi Mûmtaz çî Mehmet!)

Kenan jî wisa bersiv da:

- Zaten siz Kürtleri inkar ederek Türk yapıyorsunuz. Burada da Mûmtaz'ı inkar ederek Mehmet yapıyorsunuz. (Jixwe hûn hebûna kurdan înkarkirin. Li vê derê jî hûn Mûmtaz înkarkirin û dikin Mehmet!)

Dibe ku ev helwesta Hevalê Kenan wekî tiştê biçûk û ne girîng were nîrxandin lê ev helwesta wî xwedî naverokeke birdozî û felsefî ye.

Hevalê Kenan, mixabin li nava refên gerîla demeke kurt xebat kir û têkoşîya. Bi gumana min li dora salekê li hemberî artêşa tirkîyan ya kevnepe-rest û dirinde têkoşîya. Ew, di sala 1993'yan de li Erzeromê li navçeya Xinisê pakrewan bû û koçî ba pakrewanên mezin kir.

Ew jî wekî pakrewanê gelê kurd yê din bû xeleekek jî xeleekekî têkoşîna şerê azadiyê:

Ew şehîd e, pakrewan e Delalê dilê dayika xwe, Kurdistan e.

FERECÊ HEMÊ FEREC

02.03.1994:

Wekîlên DEP'ê hatin girtin

Wekîlên Partiya Demokrasiyê (DEP) Hatip Dicle, Leyla Zana, Orhan Doğan, Ahmet Türk, Selim Sadak, Mahmut Almak û Sırrı Sakık bi biryara Meclîsa Tirk, ji layê polîsên tirk ve bi awayekî hovane hatin binçavkirin. Hatip Dicle dema bi hevalê xwe re hate girtin, serokê partiyê bû.

BÛYERINE JI DÎROKÊ


03.03.1943:

Roja Nû dest bi weşanê kir

Kovara kurd "Roja Nû" li Paytexta Lubnan Bêrûdê, roja 3'yê adara 1943'yan dest bi weşanê kir.

Kovara Roja Nû kovareke siyasî û wêjeyî bû û ji aliyê Kamîran Bedirxan ve dihate derxistin.

Rewşenbîrên kurd û yên biyanî: Êrîş li ser herkesî ye



Harold Pinter



Şêrko Bêkes

Bi girtina Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan re gelek kesan daxuyanî da û ev êrîş protesto kir. Di nav van de gelek rewşenbîr, nivîskarên bi nav û deng jî, hebûn. Van kesan di daxuyaniyên xwe de êrîşa li ser Öcalan şermezar kir û got: "Ev êrîş li ser herkesî ye."

Di nav van kesan de nivîskarê şanoyê yê Îngilîz Herolt Pinter, xelatgirê Nobelê û nivîskarê îtalî Dario Fo û helbestvanê Kurd Şêrko Bêkes jî, hebûn. Nivîskarên bi nav û deng li ser revandina Öcalan wiha dîtînen xwe anîn zimên:

■ Harold Pinter:

Bi girtina Öcalan re, li Londonê û gelek derên din, xwe şewitandin û îşgalkirina nûnerîtiyên Yewnan, berxwedan û bibiryarbûna gelê kurd nişan dide. Gelek kes dibêjin: "Serokê PKK'ê Öcalan, terorist e". Li gorî min Dewleta Tirk terorist e. Êrîşên mezin ên li ser gelê kurd ên li Tirkiyeyê di çapemeniya Îngilîz de derketin, nehatin nirxandin û hûkûmeta Îngilîz jî, nexwest vê yekê bibîne.

Perwerdehiya bi zimanê kurdî, çapemeniya kurdî hîn jî, qedexe ne. Kesên ku li ser dîroka kurdan jî, lêkolînan dikin, cezayên mezin distînin. Li gorî PEN'a Navnetewî, welatê ku herî pir nivîskar û rojnamevan di zindanê de ne Tirkiye ye. Dewleta Tirk, di bin maskeya demokrasiyê de rejîmeke totalîter e. Terora dewletê bê tehamûl e. Di çareserkerina kêşeya kurd de, hewldanên demokratîk bi ser neketin û civakên navneteweyî jî, piştgirîya vê yekê nekir.

Xwepêşandanên kurdan, li Tirkiyeyê hin tiştan bîra me. Kurd jidil in. Tiştê wan kême; alîkarî û pejirandina mafên wan. Dema ez van tiştan dinivîstinim sloganên kurdan li ber nûnerîtiya Yewnan dibihîsim. Ev mirov, demeke dirêj

nehatin dîtî. Lê pewîst e em ji vê yekê re bêjin: Bes e.

■ Dario Fo:

Bi nişandana dimênên dawî yê Öcalan dewleta tirk dixawaze bawerîya bi serokê wan xera bike. Bi ihtîmaleke mezin, wan ew bi dermanan ew xistiye vê rewşê. Di dîrokê de tiştên wekî vê gelek in. Ji berê ve kesên desthilatdar dixwazin dîlên di destên xwe de li ber çavên cihanê biçûk bikin.


Çavên Öcalan hatin bantkirin, destên wî hatin kelepçekirin. Ev dîmen, dîmenê xeter in. Pêwîst e çapemenî neyê van listikên qîrêj. Dewleta tirk, bi van dîmenan re şerefa neteweyekî xiste bin piyê xwe. Di vê cihana weşî de ez hêvî dikim ku Ewropa rola xwe bileyze.

■ Şêrko Bêkes:

Revandina Öcalan, di dîroka me de pêvajoyeke nû da destpêkirin. Vê bûyerê hemû kurd eşandin. Ev ne pirsgerêka Öcalan tenê ye. Pirsgerêka mezin, rabûna gelekî bindest e. Di vê demê de pêwîst e hemû kurd, li ba Öcalan bin. Ev bûyer, wê agirê azadiyê geştir bike. Daxwaza azadiyê wisa bi dawî nabe. Divê her kes vê yekê bizanibe. Belkî ew bikaribin Öcalan birevînin, lê belê nikarin şoreşa kurdan, berxwedana kurdan bidin sekinandin. Vejîna kurdan, wê bilintir bibê. Ji bona vê jî, pêwîst e em ji her demê zêdetir bixebitin.

Helbet, ev bûyer wê li ser edebiyata kurdî jî, tesîrê bike. Li ser vê bûyerê wê helbest, çîrok û roman werin nivîsandin. Rewşenbîrên kurd, di vê demê de pêwîst e bikevin nava tevgerê. Ronakbîrên kurd, hem divê tevli çalakîyên gel bibin, hem jî, bi pênûsa xwe vê bûyerê şermezar bikin. Pênûsên kurdan pêwîst e hişyar bin.

PERWER BENGÎ /ALMANYA

ÇAVDÊRÎ**Komplo yê hemû kurd kirin yek**

MÎRHEM YÎÇÎT

Careke din kurd rabûn ser pivan. Vê carê jî ji bo Serok. Careke din kurd herîkin kolanan bi posterên Serok û al û dirûşmeyên neteweyî. Ji Tahranê di ser Silêmaniyê û Urmiyevê re heta bi Berlîn, Stokholm û Londravê careke din meydan ji bo Serok tîj bûn. Kurd li her derê diqirin, alên xwe li ba dikin û çendî bi biryar in, çendî ji dil in û çendî girêdavi Öcalan in, bi şeweyên herî vekirî, bi dengên herî bilind radigihînin. Sekin li kurdan tune, mîna ku li ser agir bin, hedana wan nayê, ji çalakîyê dîkevin yekê din. Kurdên her parçê û aliyên cihanê ne şeva wan şev e û ne jî roja wan maye roj. Hişê wan li ser serok e, wêneyên Serok li ber çavên wan û dengê Serok di guhê wan de ye. Ev hefteyek e Serok di nav lepên tirkan de ye. Ev dilê kurdan diêşîne û agir dixê kezêba her mirovê kurd. Hêrsa kurdan mezin e, welatgir e û derece bi derece hildikişê. Hêrsa vê carê di nav xwe de giş îdeolojî, xetên siyasî, parçeyên welêt, zarava û mezhebên kurdan berhembêz dîke. Tu carî kurd mîna îro yeker hêrs nebûne û hêrsa xwe wiha bi tebayî û bi tifaq kanalizayî heman rapêrîn, serhildan, meş û her cure çalakîya hevbeş nekirine. Ewropa seraser dihêje, pîrsa kurdan aktûel e, televîzyon, radyo û rojname cihekî mezin didîne.

Rewşa Ewropa hinekî dişibe rewşa Amerika ya piştî rapêrîna Başûrê Kurdistanê. Bush nav di kurdan dabû da ku rabin ser xwe. Pişt re kurd bi serê xwe hiştibûn. Sedam jî ev mîna fersendekê li dijî kurdan bi kar anîbû û avêtibû ser Kurdisanê. Bi dû vê re bi sedhezaran kurd ji Başûr derketibûn û derbasî bakur û rojhilatê Kurdistan bûbûn. Xelkê Amerika xwe hinekî di aliyê moral de nerehet his dikir û digot ku "ji vê rewşa kurdan em amerîkî berpirsiyar in û gerek serokdewletê me ji kurdan re tiştêkî bike." Niha jî dîtineke nêzikî vê li Ewropa çêdibe. Ewropî dibêjin "Me cih neda Abdullah Öcalan, kesî ji me deriyên xwe jê re venekir. Ger me statûyêke siyasî bidayê, rewşa wî dê niha cihê bûya û wî dê wek mirovêkî azad ji bo aştîyê xebat bikira. Dewleta tirk dê çî bine serê wî, çilo û çawa wî mehkeme bike giş bi şik in." Ji ber vê ew dixwazin heyetan bişînin Tirkiyeyê, ew dixwazin ku Tirkiye di mehkemeyêke adil û vekirî de Öcalan mehkeme bike.

Li aliyê din hin dewletên wek Îtalya û bi taybetî Yewnanîstan hewil didin ku xeletiyên xwe hinekî pîne bikin. Lewre li Yewnanîstanê di nav gel de sempatiyêke gelekî mezin heye li beramberî gelê kurd û Serokê Neteweyî Öcalan. Di bin zexta vê sempatiyê de çar wezîran, xwe ji hikûmetê kişand û îstîfa kir. Dibe ku ev prosesa îstîfakirinê li vir jî nesekine û heta bi îstîfakirina serokwezîr jî here.

Ji îro pê de kurd dê her tiştî bikin. Bit taybetî li Tirkiyeyê êdî kurd dê zêde li ser hedefên xwe nesekin û fêrê nexin navbera wan. Dê ketûber herin ser ekonomî, dezgeh û karxaneyên dagîrkeran. Komploya li dijî serok û propagandayên dewleta tirk ne ku bi tenê gelê kurd, li her derê û li giş parçeyan kire yek, belê her wiha dibe sebeb ku êdî kurd jî bi şeweyekî realîstir, aqilnetir li tîkiliyên nav dewletan û diplomasiya cihanê binêrin û ji bo xwe dersên pêwîst derxin. Kurd êdî bi çavên xwe dibînin û rojane dijî bê ka diplomasiyê karekî çendî tevlihev e, çendî xeter e, çî dikare bîne serê mirov û çawa mirov bi dev ve dikare bibe erdê.

Gotineke Petroyê Mezin heye, wiha dibêje: "Di nav ketinê de em hîn dibin çawa careke din rabin û em çawa bi ser bikevin. Kurd jî heta niha gelekî ketin, lê piştî her ketinê bi şeweyekî xurtir û bi tecrûbetir rabûn. Kurdên bûne rêxistin, bûne şervan û neteweyî bûne, dê teqez di cebbeya diplomasiyê de jî cihê xwe çêbikin û di vir de jî bi ser bikevin."

Kordînatore Zaniñgeha Azad a li Stenbolê Mehmet Hasgüler:

PKK bû hedefa s

Bi dîtina we ji bo çareseriya Kêşeya Kurd dê modelên wekî otonomî û federasyon werin rojevê?

→ Di politikaya derveyî ya Tirkiyeyê hin nakokî û nelîhevî li dar in. Bo nimûne Tirkiye alîgiriya serxwebûna Kosovayê dike lê li Bosna Hersekê li cihên ku sîrb zêdetir in Tirkiye li dijî serxwebûna sîrban derdikeve. Her wiha li bakurê Îraqê, ku kurd lê zêdetir in, Tirkiye li dijî dewleta kurdan derdikeve lê li Kibrisê, ku şeniya tirkan %18 e, mafê tirkan ê dewletbûnê diparêze. Ev yek cot pîvanî ye. Ji ber vê yekê naveroka van tîgînan (kavram) jî ne zelal e û wateya wan berevajî bûye. Divê mirov nebe dîl û esîrê tîgînan. Tiştê girîng divê mesele li gorî pêwîstiyên biçin serî. Divê li gorî pîvanên demokratîk û mafên mirovan mesele bê çareserî kirin. Dema em wekî li salên 1920'an li meseleyê binîhêrin, tu tişt naçe serî.

Niha jî dîsa behsa "paketê aborî" tê kirin. Bi baweriya rayedarên dewletê, dema rewşa aborî ya kurdan sererast be, dê Kêşeya

Kurd biçe serî. Ma rast e?

→ Ma ev paketê çendemin e! Çima ji bo herêma Behra Reş paketan amade nakin. Li vê

herêmê jî rewşa aborî ne baş e û mirov xizan û şerpeze ne. Lewre sererastkirina rewşa aborî aliyekî meseleyê. Divê Kêşeya Kurd bi her awayî were bi navkirin. Ji bo vê yekê divê dewlet li mirovên li herêmê guhdarî bike û îradeyeke hevşêrê bê pêk anîn.

Mîna divê di warê de hinekî li ser hêzên sosyalîst û çepgir rawestim. Hêzên çepgir li ser rewşa çîmayetî ya 15-20 salên dawîn tu analîzên tîrnaverokekî nekîrin. Lewre çepgir jî rastiya gel dîr in û awayên nû yên çîmayetîyê di nava çarçoveya Sewr-Lozanê de dinirxînin. Mixabin Refahê keysa xwe lê anî û piştgiriya şeniyan hejar û xizan girt.

Diviyabû hêzên çepgir li ser paketa aborî jî analîzên hûrbîn û tîkûz bikira lê mixabin çepgir dîsa gol xwar û li meseleyê temaşe dikin!

Di gotareke di rojnameya *Le Monde* de wiha hatibû gotin: "Li demê Kosovayî, Bosna Hersekê bibin lê nebin kurd." Ma bi rastî jî li *Rojhilata Navîn* ji kurdan re cih tune ye?

→ Ev yek hinekî jî girêdayî hevkarî û hev-girtina kurdan e. Dema mirov li dîroka kurdan dinîhêre, xiyaretet jî serketinan zêdetir in. Lê dîsa jî kurd tîkoşîna xwe didomînin. Rewşa Kosovayê cûda ye. Ji ber ku berjewendiyên Kosova û împeryalîstan li hev dikin, lewre barê Kosovayê sivik e. Her wiha împeryalîst hêzên kurd wekî hevalbend hilbijartin. Lewre berjewendî li hev dikin.

NATO'yê jî bo desthilatdariyê jî xwe re herêmên nû diyar kirin. Dêdikeve Bosna û Kosovayê. Bo Piştî ku Doza Filîstînê li gorî daxwazên xwe birin serî, dor hate ser PKK'ê.

Ma ev paketê çendan e! Çima ji bo herêma Behra Reş paketan amade nakin? Li vê herêmê mirov xizan û şerpeze ne. Lewre sererastkirina rewşa aborî aliyekî meseleyê.

Piştî Komploya li dijî Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan, rewşa *Rojhilata Navîn* bêhtir balkêş bû. Me li ser komplo, rewşa *Rojhilata Navîn*, tevgerên îslamî û politikayên hukûmetê yên li ser kêşeya kurd digel Mehmet Hasgüler hevpeyvîn çêkir.

Piştî vê yekê li *Rojhilata Navîn* hevkeşeya berê wê bidome an hevkeşeyê nû wê pêk were?

✓ Piştî Şerê Îranîraqê û Şerê Kendavê, îro jî ji ber Kêşeya Filîstînê wê bala hêzên împeryalîst li ser *Rojhilata Navîn* be. Sedema vê ya yekemîn petrol e. Piştî wê, ji ber petrola li komarên tirkî û Qafkasyayê wê herêm girîngiya xwe ya stratejîk biparêze. Ev rewşa ekonomî-polîtîk ya herêmê ye.

Li aliyê din li ser rewşa gelên li herêmê gotûbêjên cur bi cur tene kirin. Bo nimûne, tê gotin ku gelo wê îslamiyet bibe ideolojiya gelên Cîhana Sêyem? Ronakbîrên wekî Wallerstein li vê yekê dikolin û pêşengiya vê dîtîne dikin. Çawa ku sosyalîzm demekê ji bo gelên Asya û Afrîka wekî îdeolojiyê xelaskar hate dîtin, dibe ku îslamiyet rojekê bi vî rengî hilgire. Lê belê îslam bi vî awayî ne mimkûn e û rolê hilgire. Divê îslamiyet xwe vesazîne ango reforme bike. Heye ku Îslam ji bo gelên herêmê bibe jêderka raperîne. Lê di warê de hin guman û alozî li dar in. Wekî mînak nebûna doktrîna ekonomîk-polîtîk ya îslamê. Her wiha berî her tiştî ev pirs girîng e: Wê kîjan îslam bibe ideolojiya van gelan. Îslamiyeta li Îran, Erebiistan ango li Cezayîrê...?

Baş e. Kîjan Îslam?

✓ Îslama ku li ser bingeha yekîtîya gelan ava dibe, dê bibe pêşenga van gelan. Lê ev girêdayî dînamîkên navxweyî ye. Îslam her çend jî bo van

gelan bibe pêşeng jî lê ne pêşengê dawî ye. Jixwe vê yekê bi îslamê dest pê nekiriye.


Bi baweriya we îslama ku bikaribe pêşenga gelan bike, peyda bûye?

✓ Em niha li ser ihtimalan dipeyvin. Wekî mînak, em li îslama li Îranê binîhêrin. Ev awayê îslamê hin aliyên antîîmperyalîst dihewîne lê mixabin îslama li Îranê jî çawa ku sosyalîzma li Sovyetîstanê li ser nêrîna "li welatekî sosyalîzm" hate danîn, îslama li Îranê jî li ser nêrîna "li welatekî îslam" hatiye danîn. Ev nêrîn, xitimîn û tengîjîna sîstema li Îranê dide xuyakirin. Lewre sîstemê pala xwe da neteweperestiyê. Bi awayekî Hatemî Gorbaçov e û Îran li Yeltsînê xwe digere.

Çebû. Em hinekî li ser rola PKK'ê ya li *Rojhilata Navîn* rawestim. Ma PKK'ê li *Rojhilata Navîn* ne hêz an dînamîkek e?

Bêguman hêz û dînamîk e. Dawiya dawî bi hezaran leşkerên wê hene û li Ewropayê jî ji bo we piştgiriyeke xurt heye. Lê divê mirov analîzên xwe bes bi PKK'ê ve jî girênde. Ji ber ku aktorên sereke yên meseleyê girîng in. Ango aktorên ji bilî Tirkiyeyê jî bo herêmê planên çawa digerin? Dema em li serpêhatiya Îrlanda, Bask û Filîstînê dinîhêrin, dawiya dawî mesele li gorî dilê hêzên împeryalîst çû serî. Serokên van tevgeran bi rêbazên împeryalîst li ser maseyê hatin serwestkirin. Dawiyê doza van gelan bi rêbazên împeryalîstan hatin çareserkirin.

Bo nimûne diviyabû Îsrail wekî dewlet li herêmê tunebûya lê îro wekî dewlet li herêmê cih digire. Digel vê yekê jî Yaser Arafat mecbûr ma ku peymaneke bi dilê hêzên împeryalîst, bi Îsrailê re girêbide. Lê ev yek, bi tenê ne girêdayî helwesta Arafat e. A girîngtirîn rewşa tevgerên neteweperwer û şoreşger ên ereb e. Van tevge-



ran xwe herimandin û nekarîna pêşengiya gelan bikin.

Li aliyê din di vî warê de rola îslamê jî heye. Lewre wekî me anî ser zimên, ji ber ku îslam di warê ekonomî-polîtîkê qels e, nikare pêşengiya van gelan bike. Ji ber vê çendê mirov nikare bêje li vê cografyayê tevgerên ku bikaribin bi her awayî pêşengiya raperîneke soresgerî bikin, hene.

Ev tiştê gelekî girîng e. Ji ber ku ji bo ku pergala li *Rojhilata Navîn* were şkenandin, plan û proje tene gerandin. Em dê li rojên pêşiya me bibînin. Bi taybetî planên ku li ser Bakurê Îraqê (Kurdîstana Başûr) tene gerandin, girîng in. Gelo DYA wê ji bo Bakurê Îraqê pergaleke çawa saz bike? Diyar e di nava planê DYA de cihê PKK'ê nîn e. Jixwe operasyona li dijî Serokê PKK'ê wê yekê baş nîşan di-

stratejiya NATO'yê

Mehmet Hasgüler di sala 1966'an de li Kibrisê jî dayik bûye. Wî li Zanîngeha Enqereyê beşa Têkiliyên Navnetweyî qedand. Peyra li heman zanîngehê Cihana Sêyem doxtora kiriye. Ew niha li Zanîngeha Azad a Stenbolê li ser Rojhilata Navîn mamostetiye dike. Bi navê 'Li Kibrisê Enosîs û Têkçûna Parvekirinê' pirtûkeke wî derketiye.

welatên ereb çareser nebû. Welatên ereb di vî warî de têk çûn.

Ji ber vê yekê li dijî împeryalizmê têkoşîneke dijwar û berfireh divê. Lewre berjewendiyên hêzên împeryalist bi Tirkiye, Îran û Îraqê ve ne sinorkirî ne. Ji ber vê hindê divê mirov stratejiyên nû yên NATO'yê fêhm bike. Hûn jî pê zanin, hevalbendiya Tirkiye û Îsraîlê li dar e. Wê ev hevalbendî dirûveke çawa wergire? Li gorî dîtinê, bi vê yekê doza hevalbendiya Îran, Îsraîl û Tirkiyeyê tê kirin. Ev hevalbendî Peymana Baxdayê tîne bîra mirov. Lê bêyî Îraqê. Lewre rewşa Îraqê ya karesatane û trajîk li holê ye. Ev li dora sal û nîvekê ye ji ber ambaryoyê li Îraqê 1.5 mîlyonî mirovî jiyana xwe ji dest daye. Rewşa jin û zarok gelekî nexweş e. Lê dinyayê qet deng ji xwe neyîne. Mirov şaş û metel dimîne! Ev rasterast nijadkuji(soykırım)ye. Lê kes doza guhartina vê rewşê nake.

Gelo em dikarin bêjin Kêşeya Kurd bi her awayî kete rojeva ewrûpa û cihanê?

✓ Jixwe Ewrûpa û cihan mîmar û afirînerê Kêşeya Kurd in. Wan ev sinorên derewîn danîn. Ev kêşeyên ku îro li dar in û wekî anakronîk(derdemî) tîne binavkirin, berhema wan e. Ev hêz, bi tenê dema keysa xwe lê tînin, li ser problemên welatên Asya û Afrîkayê radwestin. Ez di tu waran de welatên rojavayî û Amerîkayê jidil nabînim. Ev welat di vî warî de xwedan berpîrsiyariyên wijdanî ne.

Lê ev welat îro pêwîstiya pergala û sistemeke nû dibînin û di sîstema mirov û gelan bi tiştekî nahesibînin. Li ba wan tiştê girîng pergala û sazûmana nû ya Rojhilata Navîn e. Ji ber vê yekê ketine taya berjewendiyên xwe û bala xwe didin kelem û astengên li ser rîya xwe.

Li aliyê din min divê vê yekê jî diyar bikim. Her çend li welatên rojavayî jî tevgerên sosyalîst û surîstparêz(çevreci) doza mafên mirovan dikin lê piştî ku Amerîkayê fûze hilavêtin Îraqê, li Amerîkayê warên nû yên karkirinê peyda bûn. Yanî karkerên nû li karistanan hatin bi cihkirin. Ev yek, ji bo aşkirina hêzên muxalîf û sendîkayan baş hate xebitan-din.

Ji ber vê çendê heya ku ev mesele ji aliyê gelên bindest ve nayên binavkirin, çareserkirina wan ne mimkûn e. Pêşîn divê ev gel xwedî li meseleyên xwe derkevin û doza çareserkirinê bikin. Lewre

wekî min got afirînerê van meseleyan welatên rojavayî ne. Heya ku gelên bindest ji bo çareserkirina van probleman zorê nadin van dewletan, ne minkûn e ev problem biçin serî.

Çêbû. Li ser Rojhilata Navîn di navbera Amerîka û welatên ewrûpî de nakokî hene û reng e ku ev nakokî dijwartir bin?

Bêguman hin nakokî li dar in. Bo nimûne, Amerîka li dijî Îranê ambargoyê digerin lê Almanya bi Îranê re danûstandinên ticarî û leşkerî dimeşîne. Diyar e ev pevçûneke lihevkerî ye. Ev welat li hev dikin û dibêjin hev: 'Tu li vê derê binihêre, ez dê li vê derê binihêrim.' Ev politîka wekî globalîzmê tê pêşkêşkirin. Lê ev jî cure û rengekî împeryalizmê ye. Bi vê yekê gelên asyayî û afrikî manîpûlê dikin. Lewre bi baweriyên van welatan, dîroka wan gelan ji aliyê wan ve hatiye nivîsin. Pêşîn ev welat kirin mêtîngeh piştê serxwebûna wan danê û peyre jî tîkiliya wan gelan bi neteweperestiyê re çêkirin. Wekî diyar e çavkaniya neteweperestiyê rojava ye. Ji ber ku kesên ku doza neteweperestiyê dikirin, hemû li rojavayê perwerde bûbûn. Îro jî hêza neteweperestiyê nehatiye şkenandin. Bo nimûne rewşenbîrên ku li dijî oryantîzmê radibin, bi tenê rexnekarîyê dikin. Hîna jî dîroka gelên asyayî û afrikî bi şeweyekî ne oryantîst nehatiye nivîsin. Kesên ku dîroka wan gelan binivîsin rewşenbîrên van gelan in. Divê bi hûrbînî li vê yekê bê kolandin.

Gelo welatên împeryalist berê jî nedikaribûn Abdullah Öcalan bi dest bixin? Çima îro? Di plana împeryalistan ya li ser Rojhilata Navîn Öcalan bi çî rengî li ber wan asteng bû?

✓ Di serdema "Şerê Nehênî(Soğuk Savaş)" de refgirtineke(kutuplaşma) dualî pêk hatibû û kesî dest dirêjî cih û warê kesî nedikir. Rewşeke serbiser (denge durumu) hatibû pê. Lê piştî ku Sovyetistan pelişi û hevkeşeyeke(denge) nû peyda bû. NATO'yê ji bo desthilatdariyê ji xwe re war û herêmên nû diyar kirin. Wekî mînak derdikeve Kosovo û Bosnyayê.

Niha îro dor hatiye ser PKK'ê û Abdullah Öcalan û lewre NATO'yê berê xwe dan PKK'ê. Gelo NATO'yê berê jî dikaribû berê xwe bide PKK'ê? Ev yek ne mimkûn e. Ji ber ku meseleya Îraqê bi her awayî nehatiye çareserkirin. Berî vê jî Qeyranê Kuweytê hebû.

Li aliyê din wê demê PKK'ê ewqas

ne xurt û mezin bû. Her wiha Tirkiyeyê dixwest bi metodên leşkerî meseleyê çareser bike. Di vê demê de 'pêvajoya payînê(bekleme süreci)' li dar bû. Lewre bi dorê berê xwe didan hêz û tevgerên muxalîf. Piştî ku Doza Filîstînê li gorî daxwaz û hêviyên xwe birin serî, dor hate ser PKK'ê. Ji ber ku konjokturê jî rê dida vê yekê. Ji bo vê yekê helwesta li dijî PKK'ê bi tenê ne girêdayî daxwaz û rewşa Tirkiyeyê bû. Her wiha konjoktura navneteweyî jî ji bo vê yekê guncaw bû. Wekî diyar e madaheleke navneteweyî heye û Öcalan rasterast bi awayekî korsanî revandin. Bêyî destûr û rêdaneke navneteweyî pêkanîna tiştekî bi vî rengî ne mimkûn e.

Gelo di vê konjokturê de mimkûn e ku hemhişyeyeke(bilinçdaşlık) Rojhilata Navîn pêk were?

✓ Bêguman mimkûn e. Hin nîşaneyên vê yekê hene. Jixwe divê mirov her dem bawerîya xwe bi gelan bîne. Dibe ku navê vê yekê cûda be, le hin dinamîk li dar in. Lewre dibe ku roj li Rojhilata Navîn hîlbê. Lê berî her tiştî divê dîroka wan gelan ji nû ve bê nivîsin. Dawiya dawî her tişt girêdahî îrade û biryardariya gelan e.

Baş e. Di vê konjokturê de li Rojhilata Navîn tevgerên sosyalîst dikarin bi roleke çawa rabin?

✓ Divê berî her tiştî pêvajoya 50 salan bi her awayî cardin were nixandî. Li ser hiqûqê, rewşa Îsraîlê, şer û aştîyê, bêçekirin û pêşketina aborî û hwd. li raboriya xwe vegere. Bo nimûne doza bêçekirinê tê kirin lê li aliyê din çek tîne kirin û firotin. îro şer û aştî ketiye nava hev. Her wiha biratiya gelan dê çawa bê danîn? Divê sosyalîst di van waran de dîtin û projeyên xwe cardin saz bikin. Ji bo raperîna gelên Rojhilata Navîn îslamî jî tîrê nakin. Lewre bar bi tenê dikeve ser milên sosyalîstan.

Li aliyê din tiştekî girîng jî helwesta li ser îslamiyete ye. Divê sosyalîst bi çavên rojavayîyan li îslamiyete ne-nihêrin û îslamiyete wekî "kevneperest, paşverû" bi nav nekin. Sosyalîst, divê li gorî rastiya gelên herêmê îslamiyete şîrove bikin û xwe ji tesîra rojavayîperestiyê bişon. Li Tirkiye doza fêmkirina gelan nayê kirin, doza darizandina wan tê kirin. Divê em bi pêşengiya pirtûka İbnî Haldun "Mukaddîme" rastiya Rojhilata Navîn cardin binirxînin.

HEVPEYVÎN: EMÎN BOZAN



de. Diyar bû ku ev hêz bi vî awayî PKK'ê qebl nakin.

We diyar kir ku li Rojhilata Navîn tu hêzên ku bikaribin pêşengiya gel bikin ne xuya ne. Lê vê dawiyê 36 rêxistinên ereb li dijî komploya Öcalan piştigiriya xwe ragihandin û gotin em dê ligel PKK'ê tê bikoşin. Gelo ev nikare ji bo raperîna gelan bibe pêşeng?

✓ Bêguman li Rojhilata Navîn hevkarîya 40-50 rêxistinên gelekî girîng e. Lewre ev rêxistin li heman herêmê tê dikoşin û dixwazin meseleyên xwe bibin serî. Di vî warî de tiştê girîng, li dijî plan û pergala hêzên împeryalist, sazîrana pergaleke nû û alternatîf e.

Serpêhatiya gelê Filîstînê bo vê yekê mîna keke bi kêr e. Hemû welatên ereb li ser Doza Filîstînê li hev bûn, lê tevî peymanên navneteweyî û pîvanên Nete-weyên Yekbûyî jî Doza Filîstînê bi dilê

Di şoresê de wêje û rewşenbîr (1)

ABDULLAN ÖCALAN

Bi giştî edebiyat û yek ji şaxên wê yên girîng pîrsa romanê dema tê rojevê, pêwîstî bi hinek nîrxandinên girîng heye. Di analîzên xwe de, her ku diçe em bêhtir li vê mijarê hûr dibin.

Bi bawerîya min divê mirov analîzên ji klasîkên wêjeya kurdî yên bingehîn bihesibîne. Metoda analîzkirinê ne bi tenê bi aliyên xwe yên siyasî û leşkerî, her wiha her ku diçe bi aliyên xwe yên civakî jî girîngtir dibe. Ez dikarim li ser romanê van tiştan mîna çavkaniyên herî girîng nîşan bidim.

Edebiyatê di rastiya civakan de her tim cihê xwe girtiye. Civak bêdebe û edebiyat nabin. Rastiya civakî ya gelekî wêjeya xwe jî derdixe holê. Dijmin xwestiye çawa Kurdistan bêsiyaset, aborî û dîrok hiştiye û bêwêje jî bihêle. Ji ber ku wêje, çand û estetîka dijmin tunebûye, tahrîbateke mezin pêk aniye. Ji ber vê çendê jî di dema me de kolonyalîzma wêjeyî di deraxeke pîr bilind de ye.

Tahrîbata kolonyalîst li ser rastiya wêjeya kurdî çî ye?

Di vî warî de tipolojîyeke seyr û balkêş derketiye holê: Ên ku di binyata xwe de kurd in lê di warê huner û wêjeyê de xwedan giraniyeke mezin in, em dê çawa binîrxînin? Ev kesên wiha dikevin nava edebiyata tirkî an edebiyata kolonyalîstên Kurdistanê yên din? Em dê van kesan di edebiyata kurdî de têxin kîjan kategoriyê? Bo nimûne helbestvanê edebiyata erebî yê mezin Ehmed Şewqî kurd e. Çawan ku di helbesta tirkî de Ehmed Arif, di sînemayê de Yılmaz Güney, di romanê de Yaşar Kemal û hwd. Ew bi eslê xwe kurd in lê wêjekar û hunermandê neteweyên serdest ên herî navdar in. Ev jî diyar dîke ku kolonyalîzm li ser wêjeyê karîger e. Asîmilasyonîst û gelekî tahrîpkar e. Divê ev yek bê zelalkirin.

A girîng di Kurdistanê sofi û wêrankîrî de rola wêjeyê çî ye? Yek ji wan faktorên ku Şoreşa Fransa û Rûsyayê pêk anîne, hebûna bingeha wêjeyî bû. Felsefeya wê, felsefeya ronahîkirinê bû. Ew dema romanê ya herî xurt, bingehêke şoresê bû. Ji bo Şoreşa Rûsyayê jî mirov dikare heman tiştî bibêje. Heke Tolstoy, Dostoyevskî, Gorkî heta Puşkin nebûya, fikirîna Şoreşa Rûsyayê dê gelekî zehmet bûya. Di Rojhilata Navîn de jî tiştên wiha têne dîtin.

Îro di Şoreşa îslamê de xitabet gelekî xurt û bihêz e. Helbestvanên ereb ên berê, heta Quran zimanekî edebiyatê, zimanekî helbestê ye. Ger em bi navê "Quran û Wêje" gotûbêjekê bigerin, em dê li ser nirxa edebî ya Quranê çî bibêjin? Ez li ser vê yekê pîr nesekinîme, lê tiştê ku pêşî bêgotin; Quran şahesereke edebî ye. Mîna roman û helbestê ye. Zimanê belagatê an-

go zelalpeviyîne yê herî xurt e. Heta mirov dikare hemû klasîkên îslamê wekî şaheserên edebî qebûl bike. Di navbera îslam û edebiyatê de têkiliyeke gelekî xurt heye.

Ger bi pîvanên hemdemî, li berhemên îslamê yên Serdema Navîn (Ortaçağ) bê nihêrîn, dê bi kêr û sîdewartir be. Ji çîrokên Hezar û Şevkê heta Siyasetnameyê, ji Şahnameya Fîrdewsî heta Mesnewiya Mewlana, hemû berhem nîv roman an berhemên pîr hêjan e.


Bi giştî rewşenbîrên ne ewrûpî, ji ber ku xwedan kompleksa xwebûkdîtîne ne, di vî warî de wan li rastiya xwe ya dîrokî nekolaye. Ev jî bo rewşenbîrên gelên Rojhilata Navîn jî wisa ye. Halbû ku mîtolojîyeke wan a dewlemend, efsane û klasîkên wan hene. Heta di wêjeya kurdî de, helbestên Feqiyê Teyran, Mem û Zîn a Ehmedê Xanî ku bi menzûm nivisiye, romanek e. Paşemîna van jî heye; divê bi binesaziya civakî û rewşa siyasî ya wê demê re têkilî bê danîn. Di teşegirtina neteweya kurd de divê cihê wê bê diyarkirin. Ev gotûbêjen dîrokî û wêjeyî divê di pêşerojê de bêne kirin. Li vir min divê bibêjim, gel ne bêbingeh û bêwêje ne. Kurd ji gelekî Rojhilata Navîn î dîrin e û di heman demê de xwediyê keleporêke wêjeyî ya herî kevn û bingehîn in.

Li vir min divê vê yekê diyar bikim: Ne ku ez gelê tirk biçûk dibînim, lê ger ji aliyê formgirtina dîrokî ve, îla behsa gelekî bêdebiyat bikin, ji gelê kurd bêhtir gelekî gelê tirk tê bîra mirov. Ji aliyê formgirtina dîrokî ve kurd di warê wêjeyî de baş bi pêş ketine. Lêkolîna vê yekê jî barê li ser wêjekarên e.

Formgirtina wêjeyî ya gelê kurd çawa dest pê kiriye û heta îro çawa hatiye? Mîjareke cihêreng ya lêhûrbûnê ye. Lê bi bawerîya min, di formgirtina civakê de wêjeya kurdî bi roleke mezin radiibe. Dibe ku devkî be an folklorîk be lê girîng e. Bi dîtina min, wekî netewe, hinek aliyên girîng ên neteweya kurd ku ji neteweya tirk heta ereb bêhtir terbiyebûyî ne, hene. Neteweya kurd di warê siyasî de hatiye kambaxkirin û hişmendîya wî ya dîrokî jî holê hatiye rakirin. Lê dema em li hin taybetiyên gelê kurd dinihêrin, em bi hêsanî dibînin ku xwedan wêjeyêke xurt e.

Rastiya wêjeyî ya gelê kurd çî ye? Çawa form girtiye? Heke bi sedan salan e bêwêjeyîyek heye, sebebên vê yekê kî ne? Rewşenbîrên kurd ku li ser dîrok û wêjeyê dixebitin, di çarçoveya rastî ya civakî û siyasî de, dikarin bi zanistî lê bikolin û bigihêjin encam û nîrxandinên girîng.

Min divê li vê derê, di Kurdistanê ku ketiya pêvajoya şoresê de, li ser edebiyat û awaya wê ya herî girîng romanê, rawestim. Wêjeye kurdî mimkûn e? Divê romana kurdî çawa bê nivîsîn? Mixabin rewşenbîrên kurd ji pêvajoya şoresê a Kurdistanê re ne amade ne. Ji ber ku ev pêşke-



Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan her çend bi bi dîtînen xwe siyasî, îdeolojîk leşkerî tê nasîn jî, dîtînen wî yên li ser wêjeyê jî cihêreng û hêja ne.

tin ne bi dilê wan e, ew hinekî jî xeyidandî û bi hêrs in. Di rastiya xwe de rewşenbîriya heyî, li gorî pêvajoya neteweperestîya prîmîtîv form girtiye. Ji aliyê mêjî û ramanî ve ji şoresêke wisa mezin re ne amade ye. Ji bo berxwedana Kurdistanê, şerê rizgariyê yê mezin û serketina Kurdistanê bêhêvî ye.

Divê rewşenbîr bi xwe êdî li xwe mîkur werin. Wekî din pêşketina mêjî û dil ne mimkûn e. A rastir me jî evqas hêvî nedikir. Dema me nû dest pê kir, me navê tevgera rizgarî ya neteweyî ya modern lê kir. Lê em bi tenê komeke biçûk bûn. Ji dayik bûbû lê mezinbûna wê biguman bû. Lê me digot tov e, dê hêşîn were.

Ji ber vê yekê divê kes nebêje çima li me rexne digire. Di serî de em pêwîstiya lixwerexnegirtinê (özelestîrî) dibînin. Lê piştê bi xebata me, vê pêvajoya dîrokî ku me dabû ser milê xwe bû rastiyeke. Niha em qebûl nekin jî, heke çavên xwe bigirin û nexwazin bibînin jî, Kurdistan ketiya pêvajoya serobinbûneke mezin. Bi başûr,

bakur, rojhilat û rojavayê ve li dîroka xwe vedigere û li ser pêşerojê plan û projeyên baş digerin.

Ya ku ez pêşîn ji rewşenbîran re bêjim: Êdî berê xwe bidin lixwemikurhatineke dilsozane. Rewşenbîr bivê nevwê jî li holê diyardeyek (olgu) heye. Harold Pinter çû Zîndana Amedê tiyatroyeke gelekî bi nav û deng nivîsî. Piştî serdaneke du-sê rojan ev kar kir. Diyar e ku serobinbûneke diwar li dar e. Çavkanî cidî û dewlemend e. Bila tu rewşenbîr nebêjin ez li ser dikim! Min cidî nahesibînin lê ez bawer im Pinter cidî dihesibînin. Ew, bo sê rojan serdaneke pêk tîne û me jî qet nas nake. Lê ji ber ku nivîskarekî pêjinkar û hestiyar e, di demeke kin de bi çavdêriyên xwe berhemeke wiha hêja afirand.

(Dê dûmahîk hebe)

Têbînî: Ev nivîs, di meha avrêlê sala 1997'an hejmarê 184'an a Serxwebûnê de hate weşandin. Ev nivîs, ji aliyê Robîn Rewşen ve bo kurdî hate wergerandin û di hejmarê 6. a kovara Avaşînê de derçû.

Navenda Çanda Mezopotamya ya Stenbolê

- 27.02.99 şemf: Konsera Koma Gulên Xerzan li YÇKM saet:17.00
- 28.02.99 yekşem: Teatra Jiyana Nû: Kómara Dînan 'Şermola' saet:15.00. Cih: Ankara Birlik Tyatrosu. NÇM İzmir
- 27.02.99 şemf: Gotübêj: "Şevên Toreyê" Kawa Nemir-A.Rahman Çelik. Amadekar: Jiyana Rewşen, saet:17.00
- 28.02.99 yekşem: Konsera Hozan Cezmî "Pêlên Ji Behra Wanê", saet:17.00



T.K.M

- 27.02.99 şemf: Pêşangeha wêneyan "Di lêkoşîna civakî de jin".

Film: "Deqa Sor". Lîstikvan: Demy Moore

- 28.02.99 yekşem: Bî jinan re sohbet (Hemû jinên afgîrê kedê dikarin beşdar bibin), saet:14.00


Navenda Çanda Ileri Gözetleme

- 27.02.99 şemf: Tyatro "Çekên Dayika Carar", saet: 19.30

- 28.02.99 yekşem: Berdewama semînera 'Tyatroya Polîtik' a Ahmet Açıl, saet:19.30

TÎŞK

Hewlekanî gorankarî le Irak û kurd



BEKIR ŞIWANÎ

Carêkî tîrîş çihani be naw demokrat û pêşkewtuxwaz û mirovdost û nazarim çî û çî, dûrûyî niwand le qise û kirdewe da yekî negirtewe. Em çihaney êsta pêy delên modêrn û hawçerx û xawen şarestanî, her ew çihane ye ke be piley yekem le dabêş kirdin û diwaxistin û meynetî em rojgarey geli kurd berpirsiyar e.

Gelî kurd le çarekî kotayî sedey bîstem da gûr be xebatî azadixwazî dedat û deyewê be sadetrîn û sirûştîrîn maftî xoy şad bêt. Rêberî şorişî em gewretirîn gele bédewletey ser rûy zemîn, wate serokî gîştî Partî Kirêkarani Kurdistan Abdullah Öcalan, her le seretakanî destpêkirdinî xebatî çekdarî da û lew roje da ke dest bo çek debat, çil (liq) î zeytûnîş be destewe degre û daway be aşî çareserkirdinî kêşey reway gelekey dekat. Ew dezanî beranber be dujminêk westawe ke le zimanî çek nebê le hîç zimanêkî tir halî nabê. Belam hemîşe û êstaşî legel da ke dîlî destî tarîktrîn hêzî ser rûy em zemîne ye, her û her kotrî aşî ye û ew kesey be wîrdî bîrî ew mirove bixwênêtewe, boy aşkira debê ke xewn bew rojewe debînê ke gelekey le aşî û azadî da jiyana berêta ser.

Ew amance pîroze Öcalanî hênaye ser ew baweriy ke Rohelatî Nawerast be cê bêlê û rû lew çihane be naw pêşkewtuxwaze bikat ke le seretawe amajeman bo kird. Ew pêy wabû ke le Ewropa eqilî serdem zal e û detwanê Rojava çayil bikat ke bîr le çareserêk bikenewe nek tenya bo azadî gelfî kurd û bedesthênanî mafê rewakanî, belkû bo rêgirtin le sirînewey neteweyekî derîni wekû kurd le ser laperekani mêjû.

Ocalan mawey çend mangêk le hewlî berdewam da bû ke dan be nasnamey siyasî ew da binrê û lew rêyewe hebûnî gelî kurd be resmî qebûl bikrê. Lê ewey cêy dax bû qise û kirdewey Ewropiyekan zor dîr bûn le ek û amade nebûn giwê bo bangî aşî kurd û rêberekey rabigirin. Emane berjewendî abûrî xoyan xiste serûy dawa rewakanî gelî kurd û neyanwîst dewletî turk le xoyan bîrencênin. Boye razî nebûn nasnamey siyasî Öcalan be resmî binasin. Eme le katêk da ke heman Ewropa nasnamey siyasî dawê be deyan hezar kurd lewaney ke lew şere helhatûn ke Öcalan niwênerayetî layekiyen dekat! Aya eger eme siyaseti banêk û dû hewa nebê, edî îtir durûyî çon e û le çî deçê!?

Rojava her be redkirdinewey nasnamey siyasî Öcalan û feramoçkirdinî gelî kurd û kêşey rewayewey newesta, belkû rastewxo kewte pilan gêran dij be kurd, ta kar geşt be wey le encamî gelekomeyekî çepelî nêwdewletî da û be hawkarî damûdezagay suxurî û hukumetekanî Emerîka, Yewnan û Kenya, raberî bizutînewey azadixwazî kurd birayewey Turkiye û xiraye ber destî rijimêk ke kemtirîn rêz bo maftî mirov dananê ca çî maftî gelêkî jêrdestî wekû kurd ke Ewropuş zor be başî eme dezanê. Amancî dujminanî kurd hemîşe ewe buwe ke mijarî Öcalan û kêşey kurd û gelfî kurd le yek çiya bikenewe. Çûnke eme xwastî yekemî dewletî turk e û pêy wa ye le nawbirdinî Öcalan hengawî sereta ye bo le barbirdinî bizutînewey azadixwazî gelî kurd le hemû parçekanî Kurdistan. Diyar e rojavaş le didî abûriyewe bo kêşekan derwanê û her le ber em hoyêş le pilanî gilawî dij be rêberî azadixwazî kurd da be şeweyekî çalak hawkarî turkî kird.

Belam ke gelî kurd le ser şaşey telefiziyonekan Öcalanî binî be dest newekani Holako'we, le naxî xoy da hestî bewe kird ke le xudî Öcalan da, sükayetî be beha pîrozekanî û hebûnî û serwerî neteweyî dekrê. Boye bo carî yekem le mêjû da gelî kurd hemû û be şeweyekî berfirawan dengî narezayî derbirî û neyhêşt rêberekey tenya bîmênêtewe, çûnke çeqo geşt ser êşk û azad zorî bo em gele çewsaweyê hêna ke be berçawî çihani be naw mirvdostew, sükayetî be xebat û sembûlekanî dekrê. Raperîni Netewey azadixwazman be tîror naw deben. Pêwîst e raperîni gelî kurdî girgirtû le çîwarçewey demokrasi da berdewam bê ta ew rojey rojava rûpoşî durûyî la debat û dest le hawkarîkirdinî dewletî turk dekêşêtewe û le çareserkirdinî kêşekeman da rol degêrê.

'Rêwîtiya ber bi rojê ve' li Festîvala Fîlm a Berlînê

'Şerê Qirêj' li Berlînê

Filmê Yeşim Ustaoglu Rêwîtiya Ber bi Rojê ve 'Güneş Yolculuk' bo xelata 'Hirça Zêr' kete 49.'emîn Festîvala Fîlm a Berlînê. Fîlm ligel 'Xelata Aştîyê' xelata 'Ferişteha Şîn' ku 10 hezar mark dike, qezenc kir. Lîstikvanên sereke yên 'Rêwîtiya Ber bi Rojê ve' Nazmi Qirix û Newroz Baz in.



Di Festîvala Fîlm a Berlînê ya 49.'emîn de filmê Yeşim Ustaoglu 'Güneş Yolculuk' Rêwîtiya Ber bi Rojê ve, xelata aştîyê girt. Jûriya Festîvalê diyar kir ku 'Rêwîtiya Ber bi Rojê ve' çîrokeke evînî ya qewimînên siyasî yên li Tirkîyeyê û meseleyeke hevaltîyê bi pejkariyeye baş anîye zimên, ji ber vê yekê 'Xelata aştîyê' standiye. Her wiha film xelata 'Ferişteha Şîn' jî ku 10 hezar mark dike bi dest xist. Film ji aliyê derhêner Yeşim Ustaoglu ve hatiye çêkirin. Lîstikvanên sereke yên film jî NÇM'ê Nazmi Qirix û Newroz Baz in. Fîlmçêker Ustaoglu heya niha ji bêyî Rêwîtiya Ber bi Rojê ve, filmekî dirêj, sê jî kurtefim çêkirine. Yeşim Ustaoglu 39 salî ye û ji bajarê Qersê ye.

"Rêwîtiya ber bi rojê ve" piştî ku xelat stand, roja 22'yê reşemiyê bo sînamahezan hate pêşkêşkirin. Fîlm mijara şerê qirêjê jî 15 salan ve li Kurdistanê tê meşandin di hundurine. Dema ku film hate pêşkêşkirin, gelek tedbirên ewlehiyê hatibûn standin ji ber tirsê ku wê Kurdistanî bo protestokirina 'Komploya navneteweyî', reaksiyonan nişan bidin.

Film ku li Salona Zoo Plast a festîvalê hate pêşberî temaşevanann, 90 deqçeyan dom kir. Mijara film li ser bandora şerê qirêjê a li ser ciwanekî tirk û yekî kurd hatiye hûnandin. Her wiha film çêlî windayên li Tirkîyeyê jî dike.

Hevdîtina du ciwanan

Film li dor serboryên Mehmedê tirk û Berzanê kurd ku li kolanên Stenbolê hev û din nas dikin berdewam dike. Berzan li Sultanahmedê bi firotina kasetên kurdî re eleqedar dibe. Mehmed jî li kolanên Stenbolê borûyên avê yên teqiyayî tesbît dike. Mehmed bi xelatiyê bîncavkirin û di îşkenceyên giran re derbas dibe.

Mehmed piştî ku tê berdand ji nû ve bi Berzan

re dikeve têkiliyê, her wiha ew ji nav civatê tê derkirin. Polis bi dû Berzan jî de ye. Ji ber ku Berzan beşdarî xwepêşandanên ji bo piştgiriya girtiyên dil dibe. Ew xwe vedîşere û bi hêviya 'ezê teqez rojekê vegerim wan deran' hesreta welatê xwe dikişîne. Berzan ku di otobûsa xeta Stenbol-Ruhayê de muawintîyê dike, ciwanên ku dixwazin beşdarî gerîla bibin, digihîjîne qada ARGK'ê.

Rojekê dîsa bo piştgiriya girtiyên ku ketine rojiya mirinê xwepêşandan pêk tên. Berzan jî beşdar dibe, lê di encama êrişê polîsan de dimire. Mehmed hevalê xwe Berzanê Zorguçî li morgê mirî dibîne. Armanca Mehmed tenê ew e ku Berzan li ser xaka wî veşêre. Ji bo ku wê pêk bîne jî radîhêje tabûta Berzan û dikeve rê. Mehmed di rê de rastî Serhildana Cizîrê, navgînên leşkerî, zarokên ku rojnameyan difiroşin û ciwanekî ku kirî jî bo leşkeriyê here Kurdistanê tê.

Piştî rêwîtiyeye dirêj Mehmed tabûta Berzan digihîjîne gundê wî Zorguçê. Lê ew gundekî ku di bin avê de maye û malên hatine xêzkirin û şewitandin dibîne. Ew tabûta Berzan berî nav avê dide.

Film bi dîmena roja ku di bin kozikên leşkerî de diçe ava û gihîştina Berzan a axa welatê xwe, diçe serî.

Eleqeya çapemeniyê

Nêzî hezar mirovî filmê 'Rêwîtiya ber bi rojê ve' temaşê kir. Her wiha eleqeya çapemeniya alman jî gelek bû. Fîlm hindik be jî bû sedema fêmkirina rastiya Kurdistan û Tirkîyeyê. Ji aliyê din ve filmê 'Güneş Yolculuk' Rêwîtiya ber bi rojê ve, di broşûra 49.'emîn Fêstîvala Fîlm a Berlînê de bû berg.

AZADIYA WELAT /BERLÎN

Biwêjine ji herêma Goyanê

Bi keskesor xemilî



Gotinên dilxweşiyê yên kurdan: dua

Destên te ter û jîn bin

Tu nekî, tu bixwî
Yeka te hezar be
Tu tehlî û tengiye nebînî
Xwedê ji te razî be
Rehma Xwedê li miriyên te be
Tu her hebî
Xwedê kurê te bi zava ke
Çavên te li riya dûr nemîne
Xwedê zarokên te bihêle

Gotinên nexweş: Nifir

Tu xwîn verêşî

Jan li te keve
Ecêbên giran bên serê te
Tu bikî nekî têr nexwî
Hawara te bê
Mala te mîrat be
Miraz li çavên te bimîne
Agir bi mala te bikeve
Tu xêrê (ji mala xwe, ji zarokên xwe û hwd.) nebînî
Çûyîna te hebe, vegeza te tunebe
Destên te bişikên.

Gotinên pêşyan ên kurdan

Xwediyê sebrê Melîkê Misrê

Heçî neke hesaba, dibîne ecêba
Ku dil neêşe, dev nabêje
Birîndar bi birîna xwe zane
Mala pîrê sitara pîrê
Dostê kevin, hespê zînkirî ye
Mirov pişta xwe ne bi destê xwe bixurîne, rihet nabe
Heta mirov deyndar nebe, maldar nabe.
Siwarê hespê xelkê her tim peya ye
Çavê li deriya, xwelî li seriya
Ava xwestî naçe serî

- * Zor gêzerê radike
- * Ku ga bikeve, kêr pir dibin
- * Mîna bizotê
- * Agir jê dibare
- * Bi mohra reş mohrkirî ye
- * Bila pozê te bişewite
- * Xîret pê re tune ye
- * Wê xelk bi hestiyê me avê vexwe
- * Min ad û wad kiriye
- * Yakî poz şewitî ye
- * Tî dibe ser avê tê tîne
- * Bi tiliyekê dikare bahrê şilo bike
- * Têr xwariye har bûye
- * Hînî stûdirêjkirinê bûye
- * Destê vala deng jê nayê
- * Ew bibêje Xwedê yek e, gerek mirov bawer neke
- * Ji bo xatirê çavekî hezar çav tî hewandin
- * Pariya di devê xwe de dide mirov
- * Tu çi dibêjî, ew qulpekê pêve dike
- * Bi keskesor xemilî
- * Êdî da ber dil bes e
- * Çiva dide xwe
- * Ez dibêjim rê va ye, ew dibêje hirç va ye!
- * Bûye benîşt, ketiye devê xelkê
- * Bi yar û dost e
- * Hêkê deynî ser dil, hêk dipêje
- * Qey ji herbê derketiye
- * Bi fal û dek e
- * Kes nikare dek û dolabên wî rast bike
- * Tu were kula wî ji min bipirse
- * Mîna çira di qiznê de ye
- * Şax û dax daye

HERÊM: GOYAN
BERHEVKAR: CÎHAN ROJ

HERÊM: LÎCE. BERHEVKAR: ROŞAN LEZGÎN


Jiyana Rewşen gihîşt hejmara 27'an

Hejmara 27'an a kovara wêjeyî, çandî û hunerî Jiyana Rewşen derket. Di vê hejmarê de ji çîrokên bigire heta helbestan gelek mijarên wêjeyî di nava rûpelên kovarê de ji xwe re cih ditiye. Di vê hejmarê de mijara danasîna helbestvanên klasîk ku ji hêla Feqî Huseyn Sağnîç ve tê kirin, Mihemed Qedri ye. Feqî Huseyn digel danasîna vî helbestvanê kurd ji helbestên wî çend nimûne rêz kirine.

Di nav rûpelên kovarê de çîrokeke balkêş ya Bavê Nazê jî hatiye weşandin. Ev çîroka ku li ser jiyana gundiyeke rebenê kurd hatiye hûnandin, ji pirtûka Bavê Nazê ya bi navê "Govenda li ber mirinê" hatiye wergirtin. Nivîseke hêjayî çêlikirinê jî "Nameyek ji Dîjleyê re" ye. Ev çîroka ku ji hêla Yaqob Tilermenî ve hatiye nivîsandin, li ser keçeke kurd radiweste.

Xebatkarê kovarê Kawa Nemir di vê hejmarê de hinek kêşeyên kurdane li ser kaxizê rêz kirine. Nivîs gelek gelemşê û gengeşiyên li ser ziman û wêjeya kurdî di nava xwe dihewîne. Ehmed Kaya di nivîsa xwe ya bi sernavê "Globalîzm û Netewetî"yê de tîkiliya di navbera van her du tiştan de şîrove dîke.

Nivîsa bi navê "Rexne û teoriyên wêjeyê" di vê hejmarê de jî didome. Destana Dewrêşê Evdî ku van rojan di nava kurdan de ji nû ve navdar bûye di nava vê hejmarê Jiyana Rewşen de jî cih girtiye. Ev destan ji pirtûka Celîlê Ce-



lîl ya bi navê "Zargotina Kurdan" hatiye wergirtin.

Di nava kovarê de gelek helbest jî hatine weşandin. Bi taybetî helbesta Harbi Soylu ya bi navê 'Destana Nameyên ji Êgir' balkêş e.

SERWÎSA ÇANDÊ

Nûbihara nû derket

Kovara Nûbihar jî bi hejmara 70'yan derket pêşberî xwendevanên xwe. Nivîsa destpêka ya di vê hejmarê kovarê de ji hêla Ali Karadeniz ve hatiye nivîsandin. Ev nivîsa bi sernavê "Zimanê peyvê û zimanê nivîsê" li ser girîngî û rewşa zimanê kurdî radiweste. Karadeniz li aliyekî bersivê dide kesên ku spekûlasyonê li ser zimanê kurdî dikin û li aliyê din jî balê dikişîne ser pêwîstiya pêkanîna yekawakirina (standartkirina) zimanê kurdî. Xwedî û Berpîrsê Karê Nivîsaran ê Nûbiharê Süleyman Çevik di vê hejmarê kovarê de li ser Seyid Evdilqadir nivîsek nivîsandîye. Di vê nivîsa bi sernavê "Li ser Seyid Evdilqadir çend gotin" de digel jiyana û ramanên Seyid Evdilqadir, der barê nakokiyên di nav kadroyên Kürdistan Tealî Cemiyetî de ji hinek agahiyan dide.

Mijareke ku di vê hejmarê Nûbiharê de bi çend nivîsan li ser hatiye rawestandîna rojnamegerî ye. Tehsîn İbrahim Doskî li ser "Mihemed Salih Bedirxan, Rojî Kurd û Yekbûn" radiweste. Her wiha Şoreşnûr Amedî jî di bin sernavê "Li ser rojnamegeriya kurdî kurtebêjîyek" de dîroka rojnamegeriya kurdî hildaye dest.


Ji bilî van nivîsan; nivîsa Çiya Mazî ya bi navê "Zargotin" û nivîsa Muhammed Garsî ya bi navê "Rexneyek li ser 'Meşreba Melayê Cizîrî' jî di nava rûpelên kovarê de balê dikişînin ser xwe.

SERWÎSA ÇANDÊ



Yê ku me rizgar bike em in

HASAN KAYA



Ku maqûl bihata dîtin, minê nivîsara xwe ya vê hefteyê ji sê-çar hevokan bihûnanda. Ma her kesî negotêdî peyv qediya. Îro ne dema peyvê ye. Jixwe ez bawer nakim ku tu peyv dê bikaribin a di dilê me de der bikin. Lê edet e, divê ku mirov cihê xwe yê nivîsînê tijî bike. Hevalên ku nivîsarên min dixwînin dizanin ku ez ji aqil bêhtir nêzî dil im. Ango di navbera siyasî û edebiyatê de bêhtir nêzî edebiyatê me. Lewre hûn xweş bibînin ku di nixandina bûyeran de ez bêhtir bûyereke erênî an jî neyînî ji aliyê dil ve dinirxînim.

Komploya ku li serê Serokê gelê kurd hate hûnandin, di ruhiyaya hemû kurdên ku piçek xîret, rûmet û hestê neteweyî û mirovahî pê re hebe de, bahozeke çêkir. Ev tiştekî normal e. Heta ku dinya hebe, ev komplo dê di huner û edebiyata kurdan de cih bigire. Helbet ne tenê di nav huner û edebiyatê de, dê di

dîplomasi, siyasî û dîroka kurdan de jî cihê girîng bigire. Ev qewimîn, mîna mohrekê dê li ser eniya gelek dewlet û neteweyan û li ser eniya hemû kurdan dewsa xwe bihêle. Ev mohr li ser eniya zaliman, dê mîna mohra lanet û qirêjîyê, li ser eniya kurdên berxwedêr mîna mohra ronahiyê, li ser eniya kurdên bêdeng û xayîn mîna mohra bêbextiyê bimîne.

Piştî vê komployê me kurdan baş fêhm kir ku heta ku lîvsorên ewrûpiyan, zilamên wan ên mîna qatiran werin nizanîm ku dera xwe li ber tavika Behra Spî biqemirînin, heta ku Amerîkî heqê hambûrgerên xwe ji tirkî û welatê me qezenc bikin, heta ku siyonîzmê hêviya xwe bi projeya GAPê ve girê bide, Serokê kurdan dê bi awayekî fizîkî êsîr be, di keleha zilmê de.

Heta ku em li benda comerdiya Ewrûpiyan bin, helbet xayînen hemû mîletan hene lê heta ku li welatê me navê xayînan jî welatparêz be, emê nikaribin serokê xwe ji nav lepên tirkan derxin.

Ey kurdê ku îro li hemberî hemû zilmarên cîhanê têdikoşe! Divê yekîtiya te ji polayê be, divê hêza te ji elmasê be. Divê fikr, plan û zanebûna te di asteke herî bilind de be. Heke ku heta îro te ji bo welatê xwe yê

êsîr yek kiribe, ji îro pê de çaran bike. Heke te heta îro tu tişt nekiribe, ji îro pê de pêncan şeşan bike. Qîmeta zengîniyên welatê xwe bizane. Bizane ku tu neviyê mirovên esil î. Lê îro tu li hemberî neteweyên ku kes nîzane ji ku hatine, şer dikî. Ne ku em hurmetê ji gelan re nîşan nadin. Lê em rast bibêjin, tirk an jî amerîkî tê wateya çî. Yanî heftê û du mîlet û nîv dîke. Ew xwediyên kîjan şarezahî û çandê ne. Ji bilî şarezahî û çanda ku wan dagir kirine. Ewrûpiyan ew qas qesr û qonax bi xwîn, ked û hêjayiyên kîjan gelan bi dest xistin. Hêj xwîna afrikayî û rojhilatîyan bi destên ewrûpiyan ve ye û ziwa nebûye. Lê mixabin li Nav ereban, li Asya û Afrikayê hêj netewe derneketine holê. Dewletên van deveran tev qabile û mîrîşînin in. Lewre ji amerîkî û ewrûpiyan re suxretî û xulamtiyê dikin. Ji ber vê yekê jî bar maye li ser piştê me kurdan. Ewrûpî dê bi kîjan edaletê me rizgar bikin. Îro li cîhana çeqelan tona edalet û namûsê bi çend filûsan (qurîşan) e.

Tiştê ku me xelas bike hêza me ye, ne bi tenê mafdarbûn û dilovaniya me ye. Heta ji me tê em xwe ji her alî ve xurt bikin, em hemû saziyên xwe xurt bikin. Di serî de ji saziya leşkerî û hemû saziyên din, saziyên diplomatîk, siyasî, aborî, çand û zanistî...

Serpêhatiyên dayika Alya:

Minê jî hinek toz jê dawêşanda

Li bajarê Edeneyê pîrekek bi navê Alya ku gelekî bi nav û deng e, heye. Her wiha dayika Alya di komisyonan jinan a HADEP'ê de ye jî. Ev dayik gelek caran hatiye binçavkirin û gelek gefên înfazkirinê li wê hatine xwarin. Lê dîsa jî wê gawek bi tenê jî bi paş ve neavêtiye. Rojekê dayika Alya dibihîze ku polîsan êriş bîriye ser maleke welatparêzêkî, li ser vê yekê ew dixwaze ku here serxweşiyê bide wan. Dema ku diçe malê dinihêre ku vê carê polîsah di wê malê de qereqol daniye. Dixwaze bi paş ve bizivire, lê ev yek pêk nayê û polîs wê derdixîne qata jorîn, gelek neheqiyê li wê dikin. Dema tê berdan û tê li mala xwe. Dema sibe dibe cîrana wê dibêje: "Duh êvarî bû çirke çirka dêrî, dema min derî vekir, ez çî bibîbim, min dît ku mêrikê li devê derî kaxizek di destê wî de ye û wêneyê ala tirk li ser e. Dema ez çav li wê ketim, ez ji xwe beyitîm (veciniqîm), tew ew jî ne bes bû mêrik got: "Ji bo Xwedê ji bo mehmetcikan ka hinek pere! hema min çawa şekala xwe ji piyê xwe kir û min li orta qafê wî xist. Mêrik reviya û min da ser piştê wî û min ew hetikand. Li ser vê yekê dayika Alya wiha



dibêje: "Xwişkê tu çima wiha yî, te çima bo çî?" Dayika Alya dibêje: "Ezê bihatama alî te, minê hinek toz jê dawêşanda."

Nifir

Dîsa dayika Alya di roja cejna Remezanê de dixwaze here ewil cejna xebatkarên saziyan pîroz bike. Piştî HADEP, Özgür Halk û TU-HAY-DER'ê diçe rojnameya Ü. Gündemê jî, dema diçe li ba bûroya rojnameyê dinihêre wa ye polîsekî xwe daye ber devê deriyê xanê. Dema polîs çav li wê dikeve, dizane ku ew kurdeke welatparêz e. Polîs ji dayika Alya dipirse: "Tuyê bi ku de herî?" Dayika Alya dibêje: "Ezê herim cejna rojnameya Ü. Gündemê pîroz bikim." Li ser vê yekê polîs dibêje: "Kesek li wê derê tune ye." Dayika Alya piştî vê yekê êdî berê xwe dide nûnergeha Azadiya Welat. Piştî ku cejna xebatkarên rojnameyê pîroz dike, çiroka xwe ji wan re vedibêje. Di vî navberê de xebatkarekî rojnameya Gündemê telefonî Azadiya Welat dike, wê demê xebatkarê li ser telefonê ji dayika Alya re dibêje: "Ka te gotibû polîs gotiye kesek li Gündemê tune ye." Piştî vê yekê hema dayika Alya destê xwe ber bi jor ve bilind dike û wiha dibêje: "Polîso tu bî, tu bi guleya PKK'ê herî!"

BERHEVKAR: FATİH BENEDEWAR

BI XELAT... XAÇEPIRSA BI XELAT (161) XAÇEPIRSA

Herfê Hesabkirin	G	D	A	A	A	A	A
Herfê Binaru	D	A	N	E	R	A	D
Herfê Çapîr	K	E	M	A	L	K	L
Herfê Çav	B	A	N	S	A	M	T
Herfê Çavê	D	E	M	D	E	M	A
Herfê Çavê	A	B	I	M	A	R	N
Herfê Çavê	E	N	T	A	Q	E	N

PEYVA VEŞARÎ → **D E R S I M**

Bersiva Xaçepirsa 159'an

Xaçepirsa me bi xelat e. Di 15 rojan de çî bersiv bigihêjin ber destê me, em dê wan binixînin û bi riya pişkê li 5 kesên belav bikin. Xelata hejmarê ma ya 161'ê pirtûka 'Ziwanê Ma, Alfaba ma' ye.

Jêrenot:
Ji bo ku bersiva we bê nixandî, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsin û tevî navnîşana xwe ji me re bişînin.

Pênc kesên ku xelata 159'an Pirtûka 'Sam Zal Rustem ve Oğlu' qezenc kirine: Agir Jiyan/Agirî, Cemal Çem/ Êlih, Zelal Rojava/Edene, Mirad Barış/ Stenbol, Ahmet Zinar/İzmîr

Pêşewa	Mam	Dengvedan	Çem	Bi îngilîzî 'mûz' Pêşengê şoreşa sovyetê	Partiyekê şoresger
Şehîdek (Wêne)	Dijberê tariyê	Rojek	Dengdarên 'pola'		
Xor		Pîşeyek			
... û peyman		Dirançêker			
Sewzeyek		Navekî rûsan	Partiyekê faşîst		
Tîpa 31. emîn			Gihanekek		Tîpa piştî m'yê
4	Demsalek			Xwarinek	
	... û nêrît			Eşîrek	
Komara				Baneşanek	
Êmê sewalan					
	Bi tirkî kurtiya birêz Paşgîrek		Beyreq		
			Agir		
Sembola hîdrojenê		Xwedan erd			
	Êş û...			Tîpa berî 'O'yê	3

PEYVA VEŞARÎ →

1 2 3 4 5

Bibo ke Dewleta Tirk raya darzîna, dari bido serokî û dariyana ey ingilêsno û vejo televîzyonan ver. Feqet ma rind zanê ke, ne Serok Apo zey Şêx Seid û Seyit Rizo yo û nê jî hereketê ey, zey hereketanê înan o. Serok hinî yew Mandela yo. Dewlet serba serok çî vana wa vajo, serok Apo rayberê ma yo.



Wext wextê yew biyayin o

Anasar (winî) wextî benê ke, kes xo bi xo vano: "Qe yew mana, nûştin û qal (qise) kerdin nêmena. La belê ancîna jî, kes ray ray nêşeno vindiro. Xenimê ma bo, weli de ma ro bo. Heqo ke ma pêro şorê xo yew pirdê berzî ra finê (berzê) cêr.

Ma qet ders nêgirotayê. Ma ne haldê Şêx Seidî ra, ne Elî Şerî ra û ne jî Seyit Rizay ra, qet çî bandêr nêbî (nêmusayê).

Eke ma tarîx ra ders bigirotayê, çiyê bandêr bibiyayê, ewro halê serokê ma wina nêbiyê. Ma çewres milyon kurdan nêşa wayirê yew merdimî vejîyê.

Şairan ra yewer vano: "Eke Homa bibiyayê kampa Auswişt çinêbiyê". Ancî Şêrko Bêkes jî vano ke, eke Homa bibiyayê halê ma kurdan wina nêbiyê. Kam çî zano, belkî jî ma hetanî nika Homay ra zaf çî pawit. Ma hema jî fahm nêkerdo ke, Homa hetê mazlûmana niyo, hetê nêheqan o.

Ma zaf herey kewtim (mendim) û zaf xetay kerdî. La belê ancîna jî, ma bizanê ke faydeyê ma, ma rê nêbo, ê kesî (çewî) ma rê nêbeno. E, ewro belkî ma bindest ê, Serokê ma esîr kewto. Feqet ancîna jî, hewawo ke şair N. Hikmet vano: "Me-



sele esîr kewtin niyo, mesele teslim nêbiyayin o."

Bibo ke dewleta tirk raya darzîna, dari bido serokî û dariyana ey ingilêsno bado (peyra) vejo televîzyonan ver. Feqet ma rind zanê ke, ne Serok Apo zey Şêx Seid û Seyit Rizo yo û ne jî hereketê ey, zey hereketanê înan o. Serok hinî yew Mandela yo. Dewlet serba ey çî vana wa vajo, serok Apo rayberê ma yo.

Ma yê serokî vira nêdê (meviradê) destê mar, mişk, faşist û kûtikan. Heme

sebebî yew kişt ma zanê ke, eke ma wayirê ey nêvejiyê, yew çî bêro ey sere, wa gumana çewî (kesî) çinêbo ke, ey peyra sire yeno ma pêrin.

PKK hetanî ewro çend ray destê xo kerd derg û dewleta tirk ra vat: "Bêrê ma pê bêrê û wa no lej biqediyoy". La belê dewleta tirk her ray de vat: "Nê ez gunî wazena û lej wazena".

Madem wina, hinî nika ra pey wextê leji (şerî)yo. Goreyê fahmkerdena min PKK hetanî nika tim û tim rîayetê "Pey-

Ma yê serokî vira nêdê (meviradê) destê mar, mişk, faşist û kûtikan. Heme sebebî yew kişt ma zanê ke, eke ma wayirê ey nêvejiyê, yew çî bêro ey sere, wa gumana çewî (kesî) çinêbo ke, ey peyra sire yeno ma pêrin.

manê Cenevre" kerdê û nêviyayê sivilanê faşistan. La belê biyayanê peyinan ra oyo ayseno dewleta tirk qe goş û çimê xo nêdana nê peymanî. Her çiqas karê min niyo jî, lazim o ke kes vajo. Na seat ra pey lazim o ke ne Peymanê Cenevre û ne jî yewna çî ma bigirê do. Çimki tawrê Ewropa jî werte de wo. Belkî ewro ra pey hinî tarzê IRA ra jî ders vetin lazimî ya, piya ma verî ra vêşî (zaf) yew bimî. Çi ki wext wextê yewbiyayin o.

C. ZERDÛŞT

WELAT
ROJNAMEYA HEFTEYÎ
(Haftalık Gazete)

■ Xwedî (İmtiyaz Sahibi)
M. NURI KARAKOYUN
■ Yönetim Yeri:
İstiklal cad. Asmalı Mescit sok. 35/37 No:308
Beyoğlu/İstanbul

TEL: (0 212)
245 16 50 - 251 79 37 - 251 90 13
FAX: 251 95 85

■ Gerinendeyê Giştî yê Weşanê
(Genel Yayın Yönetmeni)
SAMI TAN
■ Berpîrsê Karên Nivîsaran
(Yazı İşleri Müdürü)
M. SALİH TÂŞKESEN

■ ÇAPXANE
Yeni Asya Matbaacılık A.Ş.

■ Yayın Koordinasyon:
Gündem Basın ve Yayıncılık San. Tic. Ltd. Şti.
■ BELAVKIRIN
BİRYAY Dağıtım
■ NIVİSGEHÊN TÊKLİVÊ
(İrtibat büroları)
■ Amed:
Tel: 0 (412) 223 34 83
■ Mersin
Tel: 0 (324) 233 83 96
■ İzmir
Tel-fax: 0 (232) 425 37 02

■ Edene
Tel: 0 (322) 351 42 78
■ (Nünerê Giştî yê Ewropayê)
Mahmut Gergerli
Tel: 49 871 672 29
Fax: 49 871 670 815
■ Swisre:
İhsan Kurt
Tel-fax
41 21 652 76 07
■ Fransa:

M. Ali Doğan
Tel- 33 614 32 43 55
■ Belçika
I. Can
Tel: 32 53 64 12 41
■ Hollanda:
S. A. Fewzi
Tel-Fax: 31 10 48 555 43
■ Suriye:
Jana Seyda
Helim Yüsiç

Parêzer Osman Baydemir doza Öcalan nixand: Mezintirîn doza Sedsala 20'an

Bi dîtina min ev doz dê bibe doza herî mezin a sedsala 20'an. Hem aliyê wê yê siyasî hem aliyê wê yê hiqûqî û hem jî pêvajoyê û encama wê, bo aştîya Tirkîyeyê û Rojhilata Navîn gelekî girîng be. Ev yek jî aştîya cîhanê cuda nîn e.

Hûn awayê girtina Öcalan çawa dinirxînin?

Öcalan di encama hevkarîya Amerîka, Îsrail, Tirkîye, Yewnanîstan û Kenyayê de hate girtin. Lewre jî operasyoneke navneteweyî ye. Ji bo wê jî divê mirov li ser rêz û rêçikên hiqûqa navneteweyî gengeşiyekê bike.

Bas e. Girêdana çavên birêz Öcalan, kelepeçkirina wî, kişandina wêneyên wî çiqasî rêbazêke hiqûqî ye?

■ Ez bawer dikim li gorî xala 135'an a CMUK'ê di metoda lêpîrsînê de divê tu kes neyê bêhişkirin. Ev wekî îşkence tê pejirandin. Ji dimenên balafirê diyar dibû ku Öcalan hatibû bêhişkirin. Lewre binpêkirina mafên mirovan heye. Her wiha li gorî standartên Peymana Mafên Mirovan a Ewrûpayê çavgirêdan wekî kiriyareke nemirovane tê nixandin.

Dozgerê DGM'ê Mete Göktürk jî dibêje li Tirkîyeyê mehkeme ne serbixwe ne. Li gorî we, di dadgeheke wiha de darizandinê de çiqasî dadyane be?

■ Di zagona ku DGM'yê saz dike de hin xalên ku darizandina dadyane binpê dikin, hene. Ne tenê Mete Göktürk, Dadgeha Mafên Mirovan a Ewrûpayê jî DGM'yan ne hiqûqî dibîne. Her wiha rexneyên sazîyên mafên mirovan ên derbarê DGM'yan de hene û bo girtina wan kampanya dane destpêkirin. Lewre jî ne gengaz e ku DGM darizandinên dadyane pêk bînin.

Gelo Tirkîye li gorî biryara DMME (AİHM)'ê tevnege de jî Konseya Ewrûpayê bê avêtin?

■ Ger rêz û rêçikên Peymana Mafên Mirovan a Ewrûpayê bêne îhlalkirin, ew jî ber serlêdanê dikeve dewrê. Pirsgirêk pirhêlî ye. Eger dewletek mafên kesên di saziya navborî de cih digirin binpê bike, di encamê de mehkeme wê didarizîne û doza tazminatê lê vedike. Ji ber ku dewlet DGM'yê jî holê ranake û dozgerê leşkerî jî dadgehê demaxe, ji Konseya Ewrûpayê nayê avêtin. DGM dadgehên rewşa awarte ne. Lewre li gorî darizandina ne adil in.

Di vir de helwesta hikûmetê wiha ye: Ez hem mafên mirovan binpê dikim hem jî tazminatê didim.

Tê gotin ku li hin welatên rojavayî,

ji ber tesîra medya û raya giştî hin doz betal bûne. Bi dîtina we ev yek, bi taybetî jî di pêvajoya DMME'yê de, dê li ser encama darizandinê bandorekê bike?

■ Divê di pêvajoya darizandinê de her kes bi îradeya xwe ya serbixwe tevbigere û biryara xwe bide. Lê dema mirov li çapemeniya tirk mêze dike, li gorî xwe hatiye radeya biryargirtinê. Tu dibêjî qey ew doz inflata civakî dike. Di gelek dozan de ev helwesta çapemeniyê berbiçav bû, diyar e dê di wê dozê de jî heman nêzîktêdayina xwe bidomîne.

Li cîhanê dozên ku dişibin doza Öcalan hene gelo?

■ Ez başbaş pê nizamim lê bi dîtina min ev doz dê bibe doza herî mezin a sedsala 20'an. Hem aliyê wê yê siyasî hem aliyê wê yê hiqûqî û hem jî pêvajoyê û encama wê, bo aştîya Tirkîyeyê û Rojhilata Navîn dê gelekî girîng be. Ev yek jî aştîya cîhanê cuda nîn e. Ji bo pêkhatina wê jî darizandineke serbixwe pêwîst e.

Diyar e ku darizandinê de li giravekê pêk bê. Ger li gorî prensîba darizandina eşkere bê nixandîn, rewşekê çawa dê derkeve holê?

■ Em duh li Mudanyayê bûn. Wekî herêma qedexe hatiye îlankirin. Ger ji bo ewlehiyê be, mirov fêm dike. Lê li wir pêkhatina darizandinê de alozî û astengiyên mezin derxe holê. Bi taybetî bo parastinê serêşiyên mezin dê rû bidin. Heta bo ewlehiya jiyana Öcalan û her wiha têkiliya digel muwekilî jî dê dijwar be.


Hevdîtina ku we dixwest bi Öcalan re bikin hate astengkirin. Gelo hincetêke hiqûqî ya vê astengkirinê hebû?

■ Li gorî CMUK'ê parêzer dikarin di binçav de hevdîtinan pêk bînin û lêpîrsîna dozgerê û dadgerê bişopînin. Me di 22'ê mehê de serî lê da lê ji wê rojê vir de ev daxwaza me bi cih nehat.

Lewre jî bi awayekî ev binpêkirina hiqûqa hundirîn e. Yanî kesê girtî ji agahiyan hiqûqî yê parêzerê bêpar maye. Dîsa li hemberî parêzerê bûye asteng da ku peywira xwe bi cih neyne. Astengkirineke du-alî heye.

Di çapemeniya tirk de hate diyarkirin ku gelê Mudanyayê li dijî parêzeran re aksiyon nîşan daye. Li gorî we jî polîsan gelê kişkişandîye. Kîjan rast e?

■ Bi dîtina min gel jî aliyê polîsan ve



Osman Baydemir û 15 avûkatên din, jî aliyê xwişk û birayê Abdullah Öcalan ve wekî avûkatê Öcalan hatin peywirdarkirin. Baydemir her wiha Cigirê Serokê Giştî yê İHD'yê ye.

hate organîzekirin. Helwesta gel ne di wê radeyê de bû. Ev demeke dirêj e li vî welatî gelek jan û keser hatin kişandin. Ez janên dilê hemû dayikan di dilê xwe de his dikim. Lê li vî welatî hinek eş û keserên hinekan bi kar tînin.

Dozger bi hinceta rewşa hewayê piştî çar rojan çûn Îmraliyê. Gelo ev tiştêkî normal e?

■ Diyar e ku rewşekê normal nîn e. Ji ber ku saziyek bi navê "Maseya Qeyranê" heye. Tu kes der barê naveroka wê saziyê de xwedî agahî nîn e. Belkî dozger li astenga wê saziyê rast hatin. Ev aliyekî wê ye. Aliyê din jî divê bê pîrsîn; gelo bi rastî jî dozger neçûn giravê?

Li wê derê berpîrsîn emniyetê jî we re gotiye em nikarin alîkariya we bikin. Gelo hincetek nîşan dan?

■ Me serî li berpîrsînê dewletê da, divê bihata nixandîn û me encamek jê bigirta. Lê em beramberî wê yekê man: Hemû berpîrsînê dewletê yê wê derê xwe wekî aliyekî nixand û parêzer jî wekî aliyekî nixandin. Ji ber wê alîkariya me nekirin. Ne mimkûn e haya berpîrsînê dewletê yê wê ji Maseya Qeyranê tune be. Emniyet jî jê haydar e, serdozgerê komarê jî jê haydar e.

Wezaretê Karê Derve ya Tirkîyeyê di daxuyaniyên xwe diyar dike ku dê çavdêrên Yekîtiya Ewrûpayê nepejirîne. Ji aliyê hiqûqî ve mimkûn e gelo?

■ Li gorî hiqûqa navxweyî divê darizandinê eşkere pêk bê û her kes bi hêsanî temaşê bike. Ev doz jî dê dengvedaneke mezin pêk bîne. Lewre divê kî bixwaze bikaribe wekî temaşevan an jî wekî çavdêrê bişopîne. Astengkirin ne li gorî peymanên navneteweyî û ne jî li gorî hiqûqa navneteweyî ye. Yanî çavdêrî binpêkirina an jî destkariya hiqûqa navxweyî nîn e, berevajî wê prensîbeke demokrasîya hemdem e.

Niha Serokê PKK'ê ne li girîgehekê, li giravekê girtî ye. Ev çiqasî li gorî hiqûqê ye?

■ Divê berî her tiştî ewlehiya jiyana Öcalan bê girtin. Li giravekê jiyana mirovekî çiqas di ewlehiyê de ye, ez gumanbar im.

MAZLUM DOĞAN

* Roja 25'ê reşemiyê du parêzeran (Ahmet Zeki Okçuoğlu û Hatice Korkut) bi Abdullah Öcalan re hevdîtin pêk anîn. Heya rojnameya me kete çapê jî encama hevdîtinê diyar nebûbû.